




*Danere Rojnameya pêsi a Kurdi
Miqdad Mîthed Bedirxan*

"Şefqet" a hukumeta "şefaf": Haziriya qetlîameke nuh



Serokdewlet Turgut Ozal: "Ez vekirî dibêjim di dema pêşiyê de çekdarên Tirk wê bi hêzeke mezin bêن herêmê"

Serokwezîr Suleyman Demîr-el: "**Di Şerê Qibrîsê de 6 helikopterên me hebûn, lê nuha 60 helikopterên me hene. Emê pişta wan bişkinin.**"

■ Wezîrê Parastinê Nevzat Ayaz: "Li herêmê Kolorduya Ewleyî yê hatiye damezrandin. Eskerek bi tenê ji bêyî tedrîba komando namîne."

■ Serokê Erkan-î Herbê Dogan Gureş: "Ez sozê didim we, di demek nêzik de emê heyfa xwe hilinîn".

Nuceya wēr. 11'de

Mesela Kuştina Mustefa Tanguner hêdî hêdî zelal dibe

Endamê Partiya Pêşeng (PPKK) **Mustafa Tanguner** 6 sal berê (4.11. 1985) li Dänîmarkayê li bajarê Kopenhangê hatibû kuştin. Herçiqas şik ew bû ku Apoyiyan ew kuştitû jî lê qatîlên wî, wê demê nehatibûn girtin û ev mesele di "tarîtiyê" de mabû.

Di 6 û 7ê Îlona 1991ê de
rojnama Danîmarkayê "B.T"
(Brönd Tidningen) li ser tew-
qîfa qatilêن Mustafa Tanguner
du nûce çapkir.

Nûçe wiha ye: "Polisê Da-nîmarkayê ji ber kuştina Mustafa Tangüner li **Abdullah Oran** û **Ahmed Kılıç** digeriya. Dawiyê di 14. 10. 1990' de Abdullah Oran li sînorê Almanyayê hat girtin û mahkema Bronby (Bronby qezayek bajare Kopenhangê ye) ew tewqîf kir." Li gora ku ev rojname dînivisîne navê Abdullah Orhan yê Partiyê "Hemîd" e û ew endamê "Komîta Emniyeta PKK'ê ya înfaz û kontrolê" ye.

Rojnamevanê Rojnama "B.T." Afjan Sogaard nûça xwe wiha didomîne," Pişî çar mehan sawciyê Danîmarkayê ji ber kêmasiya delfî-lan Abdullah Oran serbest berda û Polisê Danîmarkayê ji ber kuştina **Abdullah Hoşgören** (Abdullah Hoşgören ji ber ku ji PKK'ê veqetiyabû, PKK'ê ew kuştibû û cesedê wî di 24'ê Sibata 1990'ê de li Almanyayê li bajarê Wipperfurth hatibû dîtin) di 7. 01. 1991'ê de bi dizî ew teslîmî polisê Almanyayê kir. Abdullah Oran tevî Ahmed Kiliç wê ji ber kuştina Abdullah Hoşgören li Almanyayê bê mahkeme kirin."

"Li gor Mudûrê Emniyetê
yê Danîmarkayê Jörn Bro, di
navbera cinayeta Abdullah

Hosgoren û Mustafa Tangu-
ner de gelek delîlên dişibin
hev hene, ji bo vê jî wê Ahmed
Kılıç û Abdullah Oran ji bo mah-
kemekirinê ji nuh ve ji Alman-
yayê bêñ xwestin. Di vî warî de
gelek delîlên xurt hene lê saw-
cî naxwaze nuha eşkere
bike."

Bi kevnewarêñ Kurdi yên li rex û rûyêñ cemê Feratê

Dîroka însaniyetê ji nû ve tê nivîsandin

Rüpel: 9

Murad Ciwan

Fehmî Kakeyî ne rastiya miletê xwe dinase ne jî rast dibêje

rûpel: 5

Nûçe

Rojeva Miehe

Bi zanatî xwe li nezaniyê datîne

Cîma ku serokkomarê Tirkîye Turgî Ozal di axaffina xwe de ya ku li meclisê kir, got ku di buhara pêşîya me de ordiya Tirk wê heşîte hezar eskerîn di jî bibe Kurdistanê û wê li dijî "tectoristên cudaxwaz" erişekî nuh a berfîre dest pê bike, gelek siyasetmedar û rojnamevan ew rexne kirin û iddîa kirin ku xwedegiravî Ozal bi xavîtiyek bêberpirsiyâr sîrre dewletê eşkere dike. Li ser vê yekê gelek tîst hatin nîvîsin û gotin, heta wezirê parastinê rabu diyar kir ku peyvî Ozal şas hatine fahmkirin, ji meqsedâ xwe hatine bidûxistin.

Leystîtek wiha hat leyistin ku, di raya giştî de jî qenætekkî wiha peyda bû ku serokkomarê dewletê xavîtiyek kir û berpirsiyâr dewletê ji dixwazin vê xavîtiyek bîncîl bikin.

Lê gelo çawa dikare ciddî ciddî pê bê bawer kirin ku di pîsek ew-qas gîring de serokkomarê dewletê bîyî ku dûrûdirê bîfikire, bîyî ku meqse-dek wî ya bi zanebûn hebe, rabe bi axaffinekê sîrre dewletê eşkere bike? Helbet bawerpêkirinek wiha ciyê pêkenînê ye. Gava meriv planênu ku ji bo rojîn pêş tê amedekirin, bîne ber çavênu xwe, wê çetir xwiya bibe ku beyana serokkomar ne eşkerekirina sîrreke bi nezani ye, lê hazzirkirina bîngehîkî ye ji bo gavênu rojîn pêş. Ev peyv ne ku bi nezani tê gotin, lê tê xwestin rayagîşti wiha jê fahm bike. Bi peyveka din ew bi zanetî xwe li nezaniyê datîne.

Gava em vê yekê bîbîjîn, helbet meqsedâ me ne ew e ku di buharê de wê tu êris neyên ser gelê Kurd û tevgera Kurdi. Esas êrisa ser gelê Kurd ne tîştek nuh û sîri ye. Ji nuha ve ordi û çekên ku li Kurdistanê ne, tîra gelek êrisen nuh ên dirindane dîkin. Ji bo êrisen nuh "sebeb" ji hene.

Tevgera Kurdi di van salênu dawî de her ku diçge pîrtir qerektereki gelêri werdigre; xebat û şerî ji bo azadiyê û ji bo destxistina maten mili édi raste rast ji ali xelkîn sivil û gund û bajaran ve tê dayin. Ji her tebagâ mîlet roj bi roj pîrtir berê xwe didin têkoşînê. Hukumeta nuh dema hat ser hukum da xuya kirin ku wê bi siyaseteke nerm û ber bi çareserkirîne here ser pîrsa Kurdi. Lê xuya bû, nermbûna wan li hember gelê Kurd ne ji bo çareserkirîna pîrsê, lê ji bo qelsxistina têkoşînê bû.

İro Tirk ji têdîgîhîn ku Kurd zêde guh nadîn vê siyaseta xapînok û ikitîfatî "nermbûnek" weha nakin. Loma xuya ye bi fermokînîna gêzerê re, di bin ebê re darê zorê ji tê nişandan. Esas darê zorê tu carî nehatibû danîn û tro ji bêperwayî li şerî mîlet dîkeva. Lé soz û bextîn hukumeta nuh, li ser hin hîviyan xeyalperestî peydakiribû ku darê zorê di vê xeyalperestiyê de hunda dibû. İro dixwazin careke din vî dari û çavênu mîlet re kin. Beyana serokkomar ji nuha ve tesîra xwe nişan daye û tîrsek di nav mîlet de peyda bûye ku ordi û hazırlıya qetîfameke mezin de ye.

Li aliyekî din pişti belavbûna Yekîtiya Sovyetan û peydabûna dîwîten Tirk li Asya Navîn, rola Tirkîye û rägabeta Tirk û Iranîyi li ser van cumhûriyetan ji pêwîsiyekî tîne ku Tirkîye rojek zûtr ji problem û ser-gejariya pîrsa Kurdi xelas bibe. Cîmki pîrsa Kurdi pîrsa her du dewlatan e û dewlet wê bixwazin ji bo berê hevdû ji Asya Navîn biguherin, hevdû bi vê pîrsê mesgûl bikin.

Tirkîye ji Balkanîn heta Asya navîn wek Tirk û Musulman xwe xwe-diya insiyatîfeke mezin dibîne. Rola serokkomarî di vê coxrafiyayê de dide xwe, xwe nêzi fîrsendîn gelek mezin dibîne û ev yek, ne bêbingeh û xayalîye, pareke mezin a rastiyê tê de heye. Bes bendek ciddî li ber vê rôle heye ku ew ji pîrsa Kurdiye. Cîgas zû û cîgas bi temamî ji vê bendek xelas bibe, ewqas zûtr û hîsâtî wê bigilîje armancen xwe.

Di mesela beyana Ozal de sedemekî din ji heye ku ji bo demen çand mehî pêşîya me ji hemû sedemîn û berbiçavîr e. Ew ji mesela planênu CIA'yê yê xistina Saddam û rola muhtemel a Kurden Kurdistan'a Iraqe ye. Tirkîye aktif di plana xistina Saddam de ci digre, lê ji affî din tîrsa wê ya heri mezin ew e ku di valayîya pişti ketîna Saddam de Kurd roleke gîring bilizîn. Xwiya ye Ordîya Tirk ji bo vê yekê di bizavekê de ye, wê xwe li ser hidûdê Iraq, ji bo mudaxelekê di alamî de bîhêle. Ji bo li ser hidûd ordîyek, demek dûrûdirê di alamî de be û tu sebebîni êrîşkariya dîrve jê re li raya giştîa cihani neyên ditin, lazim e xeterek giran û tevlihevi yan tîrsa serîhîdanekê li hundîr bê nişan dan. Dîbo ku ji hemûyan bêtir ev hazır ye ku dînêle Ozal bi zanebûn xwe li nezaniye deyne û sîre dewletê eşkere bike.

Xwendevanê hêja:

Wekî ku hûn ji dibinin, di vê hejmara pêşî ya 1992'an de me hînek guherînê teknîkî çekirin; me şablona Armancê guhert, rismê Miqdad Mithet Bedirxan: danerê rojnameya yekem a Kurdi "Kurdistan" li kîleka çep a şablonê danî. Her weha me slogan: "Serxwebûn-Demokrasî-Sosyalizm" rakir û teksta "Rojnamaya Mehane" li cihê wê danî.

Me du koşe;

"Hindik-Rindik" û "Gotinê Navdarân" rakirin. Em sipasiya nîvîskarîn her du koşeyan dîkin.

Munaqêşe ji bo:

Çareserkirina pîrsa Kurd bi metodê demokratîk

Komîta netewan ya Hevwelatiyê Helsinki bi armanca munaqêsekirina çareya pîrsa Kurdi bi riyan astî û vekirina riya diyalogê 169 zana, ronakbîr û siyasetvanê Kurd û Tirk gazî civînekî kir.

Civîn wê di 15'ê Sibata 1992' an de li Stenbolê li otêla Etap Pullman bê çêkirin. Di civînê de Murat Belge wê li ser awayen helkirina pîrsa Kurd bi riyan astî û demokratîk bîpeyive, dû re jî huquzanê qanûna esasi Zafer Üs-kül û Bülent Tanör, wê li ser li Tirkîye û li welatên din pîrsen egeleytan û anîna hukmîn qanûna esasi û demokratîk bîxâife. Di dâwiya civînê de jî wê munaqêseyek

tevayî bê kirin.

Di nav van 169 vexwendeyê civînê de Fehîm Adak, Asaf Savaş Akat, Taha Akyol, Mehmet Ali Bîrand, Mehmet Altan, Jak Kamhî, Îsak Alaton, Murat Karayalçın, Ahmet Zekî Akçuoglu, Mahmut Ortakaya, Selîm Ölcer, Altan Öymen, Sirri Sakik, H. İbrahim Çelik, Şerafettin Elçi, Eşref Okumuş, Nurettin Elhusseynî, Fethî Gümuş, Nazlı Ilicak, Şîrîn Tekeli, Latîfe Tekin, Tinaz Titîz, Talat İnanç, Mete Tuncay, Ahmet Türk, Necdet Uğur, Mehmet Vural, Ferîdûn Yazar, Leyla Zana jî hene.

Swêd:

Protestoyeke mezin li hember nîjadperestî

Li ser pêşniyara Federasyona Komelê Kurdistan li Swêdê di 21'ê Sibatê de wê protestoyeke mezin li dij nîjadperestiyê bê kirin.

Ev serê salekê ye, bi taybeti ji di van rojîn dawî de li Swêdê nîjadperest erîsi biyaniyan dîkin. Heta nuha 10 kes birîndar kirin û yekî Iranî ji kuştin. Li ser vê yekê Federasyona Kurdan pêşniyarek anî daku di 21'ê Sibatê de hemû biyani rojekê grevê bikin.

Pîsti civîna bi gelek rîxistinîn biyani û dezgeh û sendikayê. Swêdî re, biryar hat gîrtin ku di 21'ê Sibatê de saatekê bi gelek batbeten protestoyan (dev ji kar berdan, meş, debat û hwd.) nîjadperestiyê û van erîşan rûres bikin. Her weha di eyîn rojê de hemû ki-

lisên Swêdê wê li zengîlên xwe xin.

Sendikayê Karkirên Swêdiyan LO û TCO, gelek partiyen siyasi û rîxistînen mesleki û humanîter jî piştgîriya vê protestoyeke dîkin.

Li aliyê din, li hember van erîşen rasîstan di vê meha da-wîn de gelek protesto çêbûn. Yek ji van protestoyan jî meşa parlementerên Swêdiyan bû. Di meşede ci bigre hemû endamên parlementoya Swêdê besdar bûn. Herweha parlementoya Swêdê li ser re-sasîzmî munaqêseyek du rojan vekir.

Ala Rizgarî

biryar da ku bi hêz û komik û kesen ku pêşniyara yekîtiyê dane Ala Rizgarî û yên di lêgerîna yekîtiyê de ne, bide bistîne û bi wan re konferansekâ yekîtiyê bicivîne. Ji bona vê ji komisyonek hat hilbijartîn. Hegeler ev komisyona di nav 6 mehan de karên yekîtiyê hel neke wê platforma Yekîtiyâ Ala Rizgarî bi xwe belav bibe.

Armanç
Rojnama Kurdi ya mehane
Monthly Kurdish Magazine

Redaksiyon:

M. Eli
Zinare Xamo
Hesen Mizgin
Mîrza Bextîyar
Lewend Fîrat
S. Rêving
M. Lewendî
Redaktore berpirsiyâr:
M. Eli
Berpirsiyârê beşê
Dimlikî: Malmisanij

Adres :
Box: 152 16
161 15 Bromma
Sweden

Telefon
46-8-803135
Telefax:
46-8-801825

Ansvarigutgivare:
Kurdiska
Demokratiska
Arbatar Unionen
Postgiro: 50 37 99-9
ISSN: 0348 7385

Mehdi Zana li Swêdê

Mehdi Zana pişti Fransa û Îngiltereyê hat Swêdê. Bi munasebatâ hatina Mehdi Zana bi insiyatîfa Federasyona Komelê Kurdistanê li Swêdê, yek li Stockholmê û yek jî li Uppsalayê du civîn hatin amadekirin. Civîna Stockholmê di 2'ye Çileya Paşin de çebû. Di civînê de Mehdi Zana qala Zindana Diyarbekirê û jiyana xwe ya girtîxanê kir. Wî her wisa li ser pîrsen siyasi û rojane yên Kurdan jî bir û raya xwe got. Li dor 500 kesî beşdarî civîna li Stockholmê kirin.

Civîna II. ya însiyatîfa Stockholmê

"însiyatîfa Stockholmê" ku bi beşdarîya 98 Kurdan di civîna 3-5'ê Gulana 1991'ê de hatibû damezrandin, civîna xwe ya duymîn di 18 û 19'ye Çileya Paşin de kir. Lê vê carê hejmara beşdaran daket dor 50'yi. Di civînê de komîsyona bi rîvebir rapora xwe ya xebatê xwend û li ser raporê munaqêse hat kirin. Biryara civîna yekê ya pêkanîna Konferansa Ewrûpê carek din hat gîrtin. Li gor agahdariya komîsyonê wê civîna Konferansa Ewrûpê di rojén 18-20'ê Nisanê de çêbibe.

Li Uniwersîta Uppsalayê

Beşa Tercümaniya Kurdî

Uniwersîta Uppsalayê ji bo Tercümaniya Kurdi di termîna 1992-1993'an de beşek vekir. Xwendîna Tercümaniya Kurdi 40 pûan e. Kesen ku dixwazin muracaat bikin, divê bi Kurdi û Swêdî baş bizanibin û bikaribin her du zimanî jî bi baş karbin.

Ji bo agahdariyê mirov dikare bi "Enstitûta Tercümanî û Wergerandinê li Uniwersîta Stockholmê, bi Uniwersîteya Uppsalayê û bi Federasyona Komelê Kurdistanê re têkiliyan deyne.

Enstitûya Tercümanî û Wergerandinê li Uniwersîta Stockholmê: Tel:

08-16 20 00.

Uniwersîta Uppsalayê:

018-18 10 90

Federasyona Komelê Kurdistanê li Swêdê:

08-652 85 85

Abonefi
Prenumeration
Abonetiya Salekê
Li Skandinaviya

150 SKR
Maçam
Myndigheter
250 SKR
Li Ewrûpa
50 DM
Li derveyî Ewrûpa
40 \$
Anons/ilan
nîv rûpel/ en halvsidan
2500 SKR

Heyeta Swêdiyan ji Kurdistanê vege riya



Heyeta ji Swêdê çûyî hemû nûnerên rêxistinê Kurd ên humanîter û yên Cepha Kurdistanê dîtine, ji bo alîkariyên humanîter û ji nuh ve avakirina Kurdistanê li pêşniyar û daxwazên wan guhdarî kirine.

Foto: Stefan Hagberg

Di 7'ê Çileya Paşin de "Fonda Piştgiriya Kurdistanê" ji bo lêkolîna şert û îmkanên alîkariyê, heyetek ji çar kesan şandibû Kurdistanâ Iraqê. Heyet berî serêsalê bi gelek projeyên alîkariyê vege riya. Di heyetê de Taha Berwarî û sê Swêdî: parlamentera Partiya Çep; Berit Eriksson, Per Allan Olsson û rojnamevan Stefan Hagberg hebûn. Heyet pişti vege re, (10.01.1992) bi rojnameyên Kur dî re civînek çêkir. Li gor agahdariya endamên heyetê wan hema hema hemû nûnerên rêxistinê Kurd ên humanîter û yên Cepha Kurdistanê dîtine, ji bo alîkariyên humanîter û ji nuh ve avakirina Kurdistanê li pêşniyar û daxwazên wan guhdarî kirine.

Berit Eriksson dibêje, rewşa Kurdish jixwe xerab bû, lê pişti abluqaya Iraqê hîn jî xerabtir

bûye, loma ji alîkariya acil lazim e. Divê berî her tiştî meriv çandîniyê bi pêş ve bibe. Li aliye din, ew alîkariya ku ji derve diçe, heta digihîje destê Kurdish pirçik-pirçik dibe. Çimkî dolarek li bankê bi 3 Dînara ye û li bazara reş ji bi 11 Dînara ye. Loma jî divê meriv hin riyan bibîne ku alîkariyên maddî raste-rast bigihîje destê Kurdish bixwe.

Mayin Mîrinê Dîbarînîn

Stefan Hagberg dibêje ku li gor agahdariyên ku me ji serbazên A-merîkî girtin, 5 milyon mayin li Kurdistanê di bin axê de ne. Di salekê de 500 birindarên mayinan hatine nexweşxana Dianayê hîn organên wan hatine jê kîrin. Ji ber vê yekê jî hewcedariyek mezin

bi cerahan heye; hêviya gelê Kurd ew e ku tixtorê Kurd ên li derva ji bo demeke kin be ji vege rin Kurdistanê.

Di dema çûyinê de heyetê ji hesabê Fondê 300.000 Kron bi xwe re biriye. Li ser pirsa me ew di vî warî de ji agahdariyê didin û dibêjin "Me bi wan peran hin tiştîn acîl, wek tankêrên avê hwd. kirin û çend xanî dan lêkîrin". Her wisa ew dibêjin ji bo ku alîkariya bi Kurdish re hîn bi ser û bertir bibe û karibe li Kurdistanê hin projeyan bimeşîn, Xaça Sor, Rêxistina Mafê Kurdish, Fonda Piştgiriya Kurdistanê û hin rêxistinê Swêdî yên din wê bi hev re organîzasyoneke alîkariyê ava bikin.

□

Emer Debabe wefat kir

Emer Debabe, bi navê xwe yê rastîn Emer Mistefa di roja 28.01.1992'an de li Kurdistanâ Başûr wefat kir. Emer Debabe li bajarê Koyê hat dinê û li Bexdayê Ünîversîta Huqûqê qedand. Ew heta sala 1966'an endamê Partiya Demokrat a Kurdistan-Iraqê bû. Pişti 1966'an bi grûbeke endamê Buroya Politîk ve (İbrahim Ahmed, Celal Talabani) ji Partiya Demokrat a Kurdistanê vejeti ya.

Pişti 4 salan, di sala 1970'î de disa paşde vege riya nav hêzîn Partiyê û heta 1975'an di nav PDK'ê de ma.

Ew di 1976'an de çû nav hêzîn Yekiti ya Niştimanî Kurdistan û heta wefata xwe jî endamê YNK bû.

Emer Debabe, bavê keç û lawekî bû. Bi wefata Emer Debabe gelê Kurd ew lajekî xwe yê hêja û jêhatî tevgera Kurdistanâ Başûr jî kadirekî xwe yê fedekar wen da kir.

Weşîneka bi zimanê Kurdi li Australia

Dezgeha radyoya Special Broadcasting Service (SBS) dema bernameya bi zimanê Kurdi zêde kir. Ta nuha ev bername hefteyê nîv seet bû û ji bo guhdarê li bajarê Sydney, Newcastle û Wollongong (Wilayeta New South Wales) li ser pêla navîn dihat pêşkêskirin. Ji vir û şûnve bernameya bi zimanê Kurdi wê bibe 45 deqîqe û wê rojên yekşemê ji seet 11:30'ê sibê ta 12:15 û ji bo du bajarê wilayeta Victoria, Melborn û Jillong jî bê pêşkêskirin. Berpirsiyare Bernameya Kurdi Şahînê Bekirê Soreklî ye.

Dezgeha SBS dezgeheke fermî ye. Radyoya SBS bernameyên xwe bi 52 zimanân, ji bo komên etnîk li Australayê pêşkêskide.

Kesênu ku bixwazin li gel bernameya bi zimanê Kurdi peywendiye gîrebîdin, dikarin li ser vê navnîşanê binivîsinin: Kurdish Language Program, SBS radio, Box 1386, Bondi Junction 2022, Australia, (Fax 61 2 387 5800)

NEYNIK

Ronakbîriya me Kurdistan

Nurî Aldur

Ezê bi gotineke Sokrates dest bi nîvîsa xwe bikim. "Tiştî herî baş zanyarî û tiştî herî xerab ji nezanîn e". Gotineke kurt û hêsan, belê xwedî naverokeke dewlemend û mezin. Naveroka vê gotinê wilô dewlemend e ku merov dikare bi saetan li ser semîneran bide, guhdarî bike û bi sedan rûpelan li ser binivîse, bixwîne. Ji ber ku ev felsefe ye, ûlîm e û felsefe dayika hemû besen zanyariye ye.

Normên zanyariya civakî û ilmî navnetewî ne û hema bêje li hemû derê dinyayê zanyariye ev norm hatine qebûlkirin. Lê helbet disa ji her tişt ji munaqşê re vekirî ye, pêwîst e vekirî be. Ronakbîr li gor van normên felsefi, ilmî dikare komentar, analîz û netîcîn rastîn (realist) derxe meydanê.

Li vir fonksiyona ronakbîriyê xwe dide xwiyakîn ku ka merov çiqasî ronakbîr e û ronakbîrekî çawa ye, dewreke girîng dileyize. Ronakbîr ji bo avakirinê, pêşdexistinê, baş û xweşîtiyê dixebeitin û ji berhemên wan ên pozîtîf şexs û komikên der û dora wan, civaka wan û merovatiya dinyayê istifade dîkin.

Gava em li gel û welatên xelkê dinêrin, em dibînin ku di nav hemû müessênen wan de (di komele, sendîka, partiyen siyasi, redaksiyonê kovar û rojnaman da û hwd...) ronakbîr hene û ew wezîfîn xwe yên ronakbîriyê tînin cîh: ew mûsesesên xwe parce nakin, mesrefê gelek zêde nakin xwe zeif nakin, xwe ji xelkê dûr û izole nakin.

Lê ma gelo di aliyê ronakbîriyê de em Kurd di ci rewşê de ne?

Eger ronakbîren me hebin, gelo ew çawan in û ci dîkin?

Bê guman ronakbîren me ji hene -lê wexta ku pirsa "ew çawan in û ci dîkin" were holê-hîngê bersîva min ew e ku mixabin ronakbîren me yên di mûsesan da (li vir armâna min yên li Swêd dijîn û ewen ku di redaksiyonê kovar û rojnamen Kurdi de -ez organa Federasyonê "Berbang" derveyî vê mîsalê dihêlim-kar dîkin, dixebeitin û ev redaksiyonen wan kovar û rojnamen xwedî ditin û baweriyêni siyasi ne û heta hînek ji wan organen organîzasyonan in) teng difikirin, bes yên xwe û dora xwe difikirin. Ji bo nûjenbûna civaka xwe û rizgariya welatê xwe fedekariya xwe dîkin plana duymen. Eger em mîsaleke ji jiyana xwe ya Swêd bidin, bawer im mesele wê hîn bêtir zelal bibe. Di redaksiyonen rojnama "Armanc" û Kurdistan Press'ê de rewşenbîr, kadro û teknîkeren zana hene. Her du rojname ji li Swêde derdîevin. Û em hemû dizanîn ku rewşa wan ya aborî ji ne baş e. Û disa em hemû dizanîn ku "glasnost" û "perestroyka" li hemû derê dinyayê tesîra xwe da diyarkîn, -lê malesef di nav me Kurdish de nebû faktorek pozîtîf. Û em dizanîn ku pêwîstîya me Kurdish iro ji gelek kesen din li dinyayê bi hevkî, yekîti, entegrasyonê bêtir heye. Bo ci ev her du rojnamen me, "Armanc" û "Kurdistan Press" zanebûn, hûner, xebat, têkoşîn û butçen xwe nakin yek an ji bi hev re hevkîyê nakin?

Ma gelo ci ferqa ideolojîk, millî di neqeba redaksiyonen kovarîn perîyodik yên "Bergeh" û "Rojev"ê de hene? Naveroka her duyan ji nîvîsen lêkolîn, rexne û analîza millî ne. Bo ci bi hev re kar nakin? Ma ev ne kambaxiyeke ronakbîriyê ye?

Her du kovarîn me, "Roja Nû" û "Berhem" di piraniya hejmarên xwe de li ser rewşa dîrok, cografîk û çanda Kurdi dixebeitin. Ma ev ne israf û zeîfbûna ronakbîriya Kurdi ye? Ma ev ne paşdexistina serfiraziya civak û welatê me ye?

Ma ev tişt diyar nakin ku em hîn di aliyê ronakbîriyê de li paş in? Pirbûna kovar û rojnameyên me yên Kurdi ne işareteke ku em serê xwe pê bilind bikin. Pêwîst e em li kapasite û kalîta wan û li rewşa Kurdish binêrin. Rewşa me Kurdish zehmet e -gîryê gura bi rewşa me tê. Rewşenbîren me, kovar û rojnamen me, partî û komikên me û serokên me pirr in. Lî berhem diyar e. "Ronakbîr ew e ku di karê xwe yê rojane de zanyarî, bawerî, dîtinan icat dike an ji wan bi jiyanê ve girê dide, li hev tîne".

Eger gelek ji me van kesan (teknîker, redaktor, organîzator, nîvîskar, rojnameyvan, rexnegir, siyasetvan, informant û hwd.) hevkîyê bikin, emê bikarîbin normen pîr delal di nav civaka xwe de bi awakî rast û pak li ser esasî ilmî û demokratîkî damezirînin.

RAMANÊN RAMANWERAN

Bêyî Te Ez Sêwî Me

Bavê Nazê

Hevalekî ji redaksiyona Armancê berî sala nuh ji min pîrsî: "Sala ku tê tu Armançe çawa dixwazi? Tu dixwazi ci guhertin tê de çebibin."

Bi rastî ji em ci ji Armancê dixwazin Gelo "Armanc" ji bo me ci ye û tirsa min heye ku hevalen redaksiyonê xwe aciz bikin, de bila ew min efû bikin û ez ji wan dipirsim: Gelo ew heya dawî bi giringi û giraniya xebata Armancê dihesin?

Ho Xwedêwo! Çiqası rehma te pir e! Ho Xwedêwo çiqası dinya te fireh û esmâne te bilind e! Ho Xwedêwo çiqası miletên li ser erdê te pir in. Û her yek ji xwedî çand û zimanekî ne. Her yekî ji qorçikek ji xwe re girtîye û bi saya konekî nehînî xwe ji windabûnê parastiye.

"Ho milet! Ji bo ci vê çerxê de,
Çenxa peyvê, çerxa maçikirina hevvê,
Her tim barê te ketiye û dîwarê xewn
û xewa."

Bi ser te de heriftiye."

Pîştî van rêzan ez bi tenayî û valahiya dora xwe dihesim. Edî ez xwe sêwî dibînim. Dibe ji ber vê yekê ez çavêن xwe di nav rûpelên dîrokê de, li xwedîyên me dijerînim, di hişê xwe de ez li pirêza çanda me ya kevnar vedigerim. Lî belê kîlikâ ez bi tenê çend kovar û pirtûkan dibînim, bêhn li min dijike û devê min zuha dibe û ez xwe li zeviyekî beyar dimînim. Di vê rewşa perîşan de ez li dilopeke av digerim, ez singa xwe li ber surek bayê hênik vedikim. Û pêla "Armanc" dijîhê destê min, ji min re dibe ew dilopa avê û sura bayê hênik. Bi vê yekê werîs hinek li stoyê min sist dibe û bi ken û girî ez jê re dibêjim: "Bêyî te ez çiqası sêwî me!"

Pîrî caran ez ji xwe dipirsim: "Ku ev rojmana ha ji bi zimanê Kurdi nebaya." Bi nebûna wê ez di çanda me de bi kîmasiyekê dihesim. Ji ber vê yekê tirsa min pîr li ser Armancê heye û pêla hejmarek bi derengî dijige destê min, ez dibêjim: "Gelo heval nema dikarin ji bin barê wê rabibin?" De bila devê min biske û çavên min kor bibin, lî bila rojnama me roj bi roj derkeve û di nav xwendevanen de belav bibe.

Xwendevanek dikare baweriye bi gotînîn min neyne û ew dikare xisletek neqenç ji li pey xîne û bipirse: "Ev şelafî ji bo ci ne" Bê guman mirov di ramanê xwe de azad e. U ez vî mafî ji kesî hastînim. Lî belê mafî min ji heye ku ez li gor xwe bifikirim, li gor xwe xemgîn bibim û kîfxwêş bibim. Helbet ez şîrê xwe ji kesî re nakim pîvan. Lî mafî min heye ku ez li gor xwe û li gor mefahîmîn xwe Kurdayetiye fam bikim. Ci pivanen vê yekê hene? Gelo hezkirina ji bo welat çilo dest pê dike? Çilo giyanê welatperîye bi mirov re çedibe?

Ezê di vir de nekevîn mefahîmîn fel-sefi, lî bi tenê ji tecruba şexsî û li gor zan-abûna xwe vê diyardeyê belû bikim. Bi xwe tişteki eşkere ye ku prosesa xwenasînê aloz e. Li cem hinek mirovan ew di gelekt astengan re derbas dibe. Li ba min wek piraniya zarokên Kurdan, destpêka xwenasînê ji gundê me dest pê kir. Çarçewa cihana min ji ya gund derbas nedîbû. Di naşîtiye xwe de min navê netewa xwe nas kir. Û di xortaniya xwe de min rewşa gel û welatê xwe zanî. Her çiqas merfîta min zêde dibû, her ez bêtir bi heskirina welatê xwe dihesiyam. Bi xwe di qonaxa hezkirina welatê xwe de mirov dixurcile û destê xwe davêje darê xebatê. Malwîrana xebatê ji barekî giran e. Daku mirov bikaribe bi sebir vî barî hilgire û xwîzka tal daqurtîne, pîwest e hezkirina ji bo welât bête av dan. Bi xwe çend kaniyên ku av jê dizê hene. Yek

jê rûpelên dîrokê ye. Jiyana kesen ku xwe ji bo welat kirine qurban, dibe nimûne. Le-hengên dîrokî yê ku ji sinorê welatê xwe derbas bûne, bi lehengiya xwe, xwe bi miletên din didin dane. Coka din ji xurist û pêşketina civakî ye, û ya siyem ji çand û zimanê wêye.

Bi xwe roja iro ez Kurdiîya min ya berî zanîna zimanê Kurdi û ya piştî wê ne yek e. Bi hevokên spehî û gotinên resen hezkirina min xurtir dibe. Ez bêtir ji xwe ewle dibim û baweriya min bêtir bi pêşeroja miletê min tê. Heyamê berê dema danûstandina min bi çanda me re bi riya zimanen biyani bû, min xwe û çanda xwe û bi vê yekê gelê xwe ji ji yên din nizimtir didit. Nuha dîtin û şîura min tiştekî din e û ne bê bingeh e.

Ji ber vê yekê ji bo zimanê Kurdi cîyekî taybetî yê Armancê li nik min heye. Loma ji ji min re ne girtîye, ew kîjan ideolojiyê di-parêze. Çimkî ez di pêşketina "Armanc" ê de pêşketina çanda miletê xwe dibînim. Li ser vi bingehî ezê çend pêşniyar û rexnen xwe pêşkeshi redaksiyona Armancê bikim:

Hevalino, gelek guh bidin zimanê Kurdi û bi ya min pîwest e rûpelek, yan nîv rûpel li ser gramer û ferhenga zimanê Kurdi bi awaki berdewam bête vekirin. Navê quncikê dikare bibe "Zimanê me yê spehî". Ew ji bili gramerî dikare bibe meydana hevokên Kurdi yê spehî, yan ji bo metelokên Kurdi. Û ez di wê baweriye de me ku heval Remzî dikare hejmar bi hejmar vî karî bibe seri. Helbet pîwest e em hemû jê re bibin alyakar.

Rexnen min ji di warê zimên de ne:
1-Bi awayekî çewt bikaranîna prona-vanen işaretet.

2-Şâş bikaranîna navê nenas. Wek

Bi xwe roja iro ez dikarim bîbêjim ku Kurdiîya min ya berî zanîna zimanê Kurdi û ya piştî wê ne yek e. Bi hevokên spehî û gotinên resen hezkirina min xurtir dibe. Ez bêtir ji xwe ewle dibim û baweriya min bêtir bi pêşeroja miletê min tê. Heyamê berê dema danûstandina min bi çanda me re, bi riya zimanen biyani bû, min xwe û çanda xwe û bi vê yekê gelê xwe ji ji yên din nizimtir didit. Nuha dîtin û şîura min tiştekî din e û ne bê bingeh e.

nimûne: "Tu partiyekê di meclîsde piranî nextest destê xwe..." Bi xwe di zimanê Kurdi de "ek" a bi navê nenas ve dîzelique bi du dilîman radibe. Ew nav dike nenas û her weha yekhejmariya nav xuya dike. Û "tu" ji bi eynî dîlêmî radibe. Ji ber vê yekê bikaranîna "tu" û "ek" ê di eynî gotinê de nabe. Divê gotinê "tu partiyekê", "tu kesekî" bi vî rengî bêne gotin: "partiyekê, kesekî". Kurd dibêjîn: "kesek nehat" û di eynî menê de "tu kes nehatin".

3- Sernavên nivîsan. Di Armancê de sernivîs hin cara şâş in û carma ji ne bi Kurdi ne. Ezê ji hejmara 122 an çend nimûnan bidim: "Disa li piştî peyvîn şerîn, wê rastî tal be". Bibûrin ez vê hevokê dixwînim û yekser bêhna zimanekî biyani li firniken bêvîla min dikeve. Min ev hevok bi meneyen rengo-rengo xwendin. Gelo mebest ji vê hevokê ev e: "Piştî peyvîn şerîn, wê rastî tal be?"

Nimûneke din: "Li Ewrûpayê xetera dijiminatiya biyaniyan her ku diçe pîrtir dibe." Çîma semiviseke weha dirêj û bême'ne? Ev hevok ji ne bi zimanê me ye. Kurd nabêjîn: "Dijiminayetî pîrtir dibe", ew dibêjîn: "Dijiminayetî xurtir dibe." Mirov dikare bibe: "Dijiminayetî pîrtir dibe." Ji şûna hevoka Armancê divê weha bihata gotin: "Li Ewrûpayê dijiminatiya li hember biyaniyan xurtir dibe." Yan ji: "Li Ewrûpayê njadperestî xurtir dibe."

Û nimûneke din: "Hestiyê ziman tun-eye." Bi xwe Kurd bi mena zimandirêjîye û azaftina pirr, hevoka Armancê bi vî awayî bi kar tînin: "Ziman bê hestî ye."

Mixabin di her hejmareke Armancê de xwendevan pêrgî sernavên weha dibin û ew bêhemdê xwe ji xwe dipirsin: Çîma zimanê Armancê bi giştî sivik û rind e, lê sernav bêçejîn in û ne balkêş in? Gelo ji kîmtecru-betiya rojnamevaniya Kurdi ye?

Û navê du quncikê standard yên Armançe nakevin serê min:

- 1- Ne karê aqila ye, lê rast e,
- 2- Ramanê ramanweran.

Piranîya kurdan dema di warê ziman de rexna li hev dikin, devoka xwe ji xwe re dikin pîvan. Yek dibêjî li ba me weha tê gotin, yê din lê vedigerine: li cem me wilô nabêjîn, halo dibêjîn. Di pirsa nêr û mîyi-tiya peyvan de mirov dikare loman neke. Çareserkirina vê problemê roja iro pir dijwar e. Lî belê di warê din de eger ziman-nas bi bêhneke fireh herin pîrsê, wê bikar-ibin li hev bikin û rîyeke durist jê re bibin.

Ez di wê baweriye de me ku di zimanê me de pirsa hevokên standard qabilî du-ristikirin û lihevhatinê ne. Emê quncika "Ne karê aqila ye, lê rast e" wek nimûne bigrin. Bi xwe li gor naveroka quncikê divê ev nav lê bibe: "Dûri aqila ye, lê rast e". Ev gotin tê vê me'nê : "Ne meqûl e, lê wilô ye". Lî belê ibaretâ "ne karê aqila ye", me'neka din dide. Ew wek "karê dinan" tê fam kirin. Dema yek ji karê yekî aciz be, ew bi xeyd dibêjî: "Ma ev karê aqila ye?" Ji bona ku tevîhevi di serê xwendevanen de çenebe, pîwest e wilô bê gotin: "Dûri aqila ye, lê rast e."

Herçi quncikê "Ramanê Ramanweran" e, di mentiqê xwe de şâş e. Kîlikâ awirê min li peyva "ramanweran" dikevin, pêre-

pêre navê Volter, J. J. Rousseau, Hegel, Sartre û Faubache têne ber çavên min. Çumkî ramanwer mirov xwedî tefkire kûr û resen e. Ew xwedîyê mezhebeki fikri ye. Ew medresek bixwe ye. Edî çîma Armancê navê ramanwer li her kesekî çend pîrtik û meqale çap kirine, dike. Di vî warî de gelekt tevî-hevi dikeve mefahîmîn û intelîgent, ronakbîr û ramanwer. Bi xwe ez fam nakim çilo Armanc bi hêsanî dikare navê ronakbîrî bi yekî ve ke. Disa ev tê wê me'nê ku hevalen redaksiyonê peyva "ronakbîr" bi mene'yeke pir fireh distîn. Ronakbîr ne bi mena intelîgent e. Ew bi mefîhûmî xwe bilindir e. Ronakbîr ew mirov e ku merîfetê belav dike. Ew merîfetê ke nuh û pêşkefi li civakî belav dike. Ji navê wî tixwîbînuh di warê zanyariye de dest pê dike.

Heger em ne paye bin, û xwedî nefsek biçuk bin, divê em xesleten weha li ber navê xwe qebûl nekin. Û Armanc ji divê wilô bi comeđî leqebla li kesen ku jê re di-nivîsan, belav neke. Rastî tal e, lê pîwest e bête gotin. Di heyamê me de ronakbîr û ramanweren Kurd nînîn.

Heger Armanc dixwaze quncika "Ramanê Ramanweran" bimîne ji dikare naveki din lê bike. Ew dikare bibe "Menbera Aza" ji bo nêrînên rengo-rengo.

(*) Hebesta Ebdurrehman Mizûrî: "Ho Miletol"

Sînîyên me

Lawikê Berrîvanî

**"Hingor Baş"
Xwendevanno!**

Gava min zimanê Swêdî dixwend, mamosteyekî min î gelek zîrek hebû. Gurê zimanban bû; bêyî zanîna çend zimanê Ewrûpî, ji her xwendevanê xwe jî bi zimanê wan fêrî hin gotinê rojane, wek "roj baş!", "êvar baş!", "sipas", "tu çawa yî, tu baş i?" dibû. Gotinê weha carna min jî fêrî wî dikirin. Lî wî tu carî qîma xwe bi vê alîkariya min nedianî, dixwest Kurdi bi rîk û pêk, yanî wek wî fêrî me dikir, ji kitêban fêr bibe. Li hember vê daxwaza wî, min hustuyê xwe xwar dikir û digot: nuha kitêbek weha tuneye, lê muheqeq wê rojekê bi saya hin zimanzen me ewê jî çebibe.

Roj hat, min mekteb qedand û min û mamostê xwe bivê nevê hevûdu wenda kir.

Lî em dizanin dunya biçuk e û tesaduf jî pirr in. Wê êvarê li kolaneke Stokholma xopan ez û mamosteyê xwe yê zîrek rastî hev hatin. Min hew carê dît ku yekî ji para dest da ser milê min û got:

-Hingor baş! (1)

Min "baş" a wê fam kir, lê ev "hingor" ci bû? Lî min "nezanîya" xwe neda der û min got "êvar baş!"

Piştî çend gotinê virde-wêde mamostê min bi gotineke din ez mat hîstim:

-Ka em herin xwerekxanekê. (2)

Edî min zanîbû mamosteyê min ne xalî ye, me berê xwe da "xwerekxana" dostekî min ê Kurd. Ez serê we neêşînim, li "xwerekxanê" li dora mase-yekî me cî li xwe xweş kir. Hîn ji ber gotinê mamostê min, hişê min baş nehatibû serê min, wî ji nû ve dest bi wê Kurdiya xwe ya bilind(!) kir:

-Qutabiyê(3) min ê berêz, tendurustiya(4) te çawa ye?

Zimanê min bi carê de li hev gobili, lê wî do-mand:

-Muxbeçeyê (5) hêja heke(6) renc(7) nebe sewilek(8) av teka(9) dikim.

Her çiqas garson ji Kurd bû, lî ji daxwaza mamos-tê min tu tiştek fêm nekir. min jî hîn fersend nedîbû ku bîbêjîm: "Ez bi dora wî seri, wî aqîli, ma te ev ziman ji ku derê anî?" Wî got:

-Mihriv(10) gilkana(11) xwe bide, ezê hejmara telefona(12) te binivîsim.

Edî min hew xwe ragit:

-Ez benî, kî ji te re ev ziman çêkiriye?

Ji bîrîka xwe kitêbeke qapaxzer derxist û dirêjî min kir û got:

-Te digot wê rojekê zimanzenek derkeve, a va ye derkefîye, qey haya te jê nîne.

Navê kitêbê "Peşerîya Hewisîna Zmanê Kurdi" yanî "Metoda Fîrbûna Kurdi. bû. Nîvîskarê wê Feqî Huseyn Sağnîç" e. Min li kitêbê mîze kir û hînekî xwend. Ev cara pêşî bû ku ez bi kitêbekê him hewqasî dikeniyam û him jî dîqehêrim. Dikeniyam, çimkî min fam nedikir kitêbeke weha çawa dikarîbû bihata çapkirin. Lî sosreta herî giran ji cara pêşî bû ku bi xêra Tirkî min ji kitêbeke Kurdi fam dikir.

Erê kitêba Feqî ji ali şikil ve wek kitêbekê hatiye çapkirin, lî ji ali nîvîsîn xwe ve xalis muxlis nes-neyeke pêkenînê ye; çawa ku mûz bi ci nîtê were xwarin dibe ew tişt. Gava bîhna mirov teng be, mirov dikare wê wek tekstên mîzahî bîxwîne, yan jî wek tiştanokan pê şîvberka zarakan derbas ke. Ji vê "Încîl" a Feqî Huseyn ezê çend nimûneyan li jêr pêşkeshi bikim (di nav parantez de min Kurdiya wan nîvîsi)

Berçay (xurînî, taştê. Ê lî ku serê sibê em sorbê vexwin tu yê bîbêjî ci? Qey wê bîbê bergorbe)

Debîba çenda ?(sinifa çenda?)

Qenc û qenc (oxir be)

Hamojoja (enstitü)

Peywira te ci ye? (wezîfa te ci ye?)

Psikan bibirin? (fatûrê bibirin)

Bifermo, mihriv rûnîn (kerem kin, rûnîn)

Di nîvîstanâ parêzerda (li buroya abûqat)

Zernîşan, dê ka berkêse mezirîn (Zernîşan, sîfrê raxe)

Pirsegirêkên Zimanê Kurdi

Niviseke Fehmî Kakeyî bi ser-navê "Gelo em hemû ne Kurd in?" di hejmara 76 (8/91)'an a Berbangê de derket. Nivis li ser muşkulên hebûna lehcen zimanê Kurdi radiweste ku di dibistanê Swêdi de derdikevin holê.

Fehmî Kakeyî bi vê nivisa xwe balê dikşine ser problemeke ji yên here girîng ên civaka Kurdan ku astenek esasî ye li ber avabûna yekîtiye tekûz a mîl. Ew jî problema hebûna lehcen cihê û tunebûna zimanekî yekîrti yê mîlî û giştî ye ku li seranseri Kurdistanê hemû Kurd bi hêsanî jê tê bigihê. Ev yek dibe sedem ku li wan welat û cî û warênu ku hînkirina zimanê Kurdi serbest e, Kurd nikarin ji bo hînbûnê zimanekî yekîrti hilbîjîn ku ji alî hemû Kurdan ve tê fêmkirin. Di şuna wê de her malbatek Kurd di dersa hînbûna zimanê zîkmakî de, xwediyê kîjan lehcê be, wê lehcê hil-dibijere.

Ev yek eşkeretirin li Swêdê xwiya dibe. Kurden ku hatine Swêdê ji hemû perçen welêt hatine û her hinek bi leheçeyekê diaxîvin; Kurmanc, Soran, Dimili, Hewramî, Feyli û Lorî.

Ji armancên hebûna dersên zimanê zîkmakî di dibistanên Swêdiyan de yek jê jî ew e ku gava zarok nuh tê Swêdê, li dibistanên wê, bi riya hebûna mamosteyekî zimanê zîkmakî zûtir û hêsanîr hîni Swêdî û jiyanâ rojane û a dibistanê bibe, xerîbiyê nekişine. Ji bo ku zarok karibe têkeve nav imkan û hesaniyeke wiha, li malê kîjan zimanî dipeyive divê mamostê zimanê zîkmakî bi wî zimanî bi zarok re peywendiye deyne.

Ji bo zarokên miletén ku zimanekî wan ê yekîrti heye problem hêsan e. Lî gava mesele tê ser zarokên Kurdan dijwariyek diyar dertê pêş. Her Kurdeku ji welêt tê, bes hay ji lehcâ xwe heye. Soran bes bi Soranî, Kurmanc bes bi Kurmancî û Dimili jî bes bi Dimili dizane.

Ji alî axaftin û têgîhiştinê ve ji divê em qebûl bikin ku ferqek zêde di navbera lehcen Kurdi de hene. Ev, ferqek wiha ye ku di destpêkek ne kurt de xwediyêvan lehcan ji hev fam nakin. Heta wiha lê hatiye ku Kurdeku Kurdistanâ Tirkîye, di xewna xwe de ji Soranî, Hewramî yan Feyli nebihîstiye. Yê Soran, Kurmancî yan Dimili nebihîstiye, lê di riya hînbûn an radyo û televizyonê re aşinayî Erebî, Farisi yan Tirkî bûye, lê tu cari lehcen din nebihîstine. Loma jî têgîhestina Farisi, Erebî yan Tirkî ji wan re ji lehcen din hêsanîr e.

Gava rewş wiha be, gelo wê zarokên Kurdi yêne Swêdê bi ci awayî bibin xwediyêvan mamostê zimanê zîkmakî? Car heye ku yekî Soran dibe mamostê yekî Kurmanc, yan Dimili, ku zarok û malbata wî bi rastî jî jê fêm nakin. Yan jî yekî Kurmanc dibe yê yekî Soran. Ne ev tenê, alfaba Kurdan ji ne yek e. Li Kurdistanâ Iraqê û Iranê alfaba Erebî, li ya Tirkîye û Sûriyê û derveyî welêt ya Latinî bikar tê. Bi navê dersa zimanê zîkmakî, zarokên Kurdi car heye tuşî ecêbek wiha tênu ku ne ji lehcâ ku jê re tê hînkirin û ne ji ji alfaba wê fêm diken. Heta ji alî alfaba Latinî ve hêsayiyek heye. Kurden Kurdistanâ Iraq û Iranê ji bo ku li wan welatan bi saya hînkirina zimanê Îngilizi, Firansî an zimanekî din ê Ewrûpî û bi saya hîndekarya li Swêdê alfaba Latinî (bi tevayı ne wek a Kurdi be ji) hînekî nas diken û ji bo rojîn pêş ji wan re lazim dibe. Lî gelek ji Kurden Kurdistanâ Tirkîye, alfaba Erebî nedîtine û di rojîn pêş de iştîmalek mezin wê tu cari ji wan re lazim ji nebe.

Fehmî Kakeyî ne rastiya miletê xwe dinase ne jî rast dibêje

Fehmî Kakeyî jî li ser vê problemê radiweste. Lî ji dêvla ku rastiyê û sedemên rastîn ên vê yekî destnîşan bike, meselê bi Kurdbûn an ne Kurdbûn, yan bi welatparêzî an xayintiya Kurdan ve girê dide.

Ew idîa dike ku, malbatên Kurden Soran, gava mamosteyekî bi lehcâ Soranî û bi alfaba Erebî li dibistanekê tunebe, qayil dîbin ku mamosteyekî bi lehcâ Kurmancî û bi alfaba Latinî derse bide zarokên wan; lê yên Kurmanc û bi taybetî yên Kurdistanâ Tirkîye gava mamostê bi lehcâ wan tunebe, qayil nabin ku mamosteyekî bi lehcâ Soranî û bi alfaba Erebî dersê bide zarokên wan. Ev, idîayek bêbingeh û hissî ye. Ne ku Kurmanc yan Kurden Kurdistanâ Tirkîye bi tenê, lê bi giştî Soran ji û Kurden perçen din jî pê qayil nabin ku bi lehcîyek din dersa zarokên wan bê dayîn. Li hin bajarênu Swêdî ji bo ku mamostê lehcâ Soranî tuneye, zarokên wir bêyî dersa zimanê zîkmakî mane. Berpirsiyârên Belediyan ilanen didin rojnamen ku mamostê Soranî bi destxin.

Fehmî Kakeyî, li hember Kurden Kurmanc bi însaftîr e, qe nebe razî dibe ku bi Kurmancî dersê bixwînin, lê li hember Kurden lehcen din wek Dimili, Hewramî û Feyli yekcar çavşor e. Rexnê li wan digre ku çima li derveyî welêt (her wekî li Swêdê) li nik dezgehen resmî qal dîkin ku xwendan lehcîyek cihê ne, doza xwendina Kurdi bi lehcâ xwe dîkin, çima bi Soranî yan Kurmancî naxwînin. Ew ji dêvla ku li sedemên vê yekî yên sosyolojîk, psîko-lojîk, tarixî û hwd. bigere, raste rast kesen wiha xayîn û ne Kurd ilan dike. Bi ya wî be, bes e ku her kes bi Soranî û bi alfaba Erebî bixwîne û binivîse, lê xwiya ye ji ber ku lehcâ Kurmancî ji idî xwe ji ber lepênu wî xelas kiriye, nikare bêje ku çima bi vê lehcê tê xwendin, bêyî dilî xwe be ji bi du lehcan razî dibe û dibê bila ev her du lehcê bêxwendin û nevîsandin. Loma jî aciz dibe ku çima hin radibin doza Dimili, Hewramî û Feyli dîkin. Ew van lehcan bêqîmet dibine û xwe şermezâr his dike, gava li hember dezgehen Swêdî behsa hewqas lehcâ dibe. Ew şermezâr dibe ku biyanî pê dihesin ku gelek lehcen cihê di Kurdi de hene û Kurden van lehcan ji hev têgîhiştin. Loma jî daxwaz ji xwediyêvan lehcan dike ku dev ji daxwazên xwe yên wiha berdin, rastiya miletê xwe veşerîn, wî li hember biyaniyan ewqas ji şermezâr nekin. Bi vê rewş xwe ew ji bir dike ku bi veşartîn rastî ji holê ranabin û ya heri girîng problemen vê rastiya bi tepeşandinê çareser nabin. Ya din ew bi wan daxwazên xwe dide xwiyakirin ku biyanî ji wî çetîr rastiya miletê wî dinasin. Çimki eger wî rastiya miletê xwe bizanibiya, wê hay jê hebûya ku nifusa Dimiliyê Kurdistanâ Tirkîye ji nifusa Soranî Kurdistanâ Iraqê ne pirtir be, ne kêmtrir e ji û wê negota ku ev lehce lehcene piçûk in. Pişî wê di meselek wiha de, esas têgîhiştin e, piçûkî tu manê ifade na. Dimili, Hewramî yan Feyli bi nifusa xwe piçûk bin ji pişî ku ji Soranî fêm nakin, gelek tebî ye ku daxwaz bikin ku bi zaravê ew jê fam dîkin hîni xwendin û nivîsanda zimanê xwe bibin.

Fehmî Kakeyî bi van iddia û daxwazên xwe, ne wek mamosteyekî zaro-kên Kurden ku hay ji rastî û derd û êşen miletê xwe hebe dinivise lê wek militanekî xav û siyasiş sur kîşaye, bi vî alî û wî alî de dibire û bi bînsafî fer-manen Kurperwerî û xayintiyê der-tîne. Eger, bi şûrkîşya wî be meriv dikare gelek Kurden din jî ne Kurd û newelatperwer ilan bike. Nimûneyek balkêş di nav me Kurden Swêdê de heye. Di xebat û meş û kar û barân Kurdayetî de li Swêdê, gava ji bo Kurdistana Iraqê û ya Iranê be Kurden perçen din bi taybetî Kurden Kurdistanâ Tirkîye û Kurmanc û Dîmilî bi piraniya xwe di van meş û karûbaran de besdar dîbin. Lî gava bûyê li ser Kurdistana Tirkîye be çend Kurd ne tê de Kurden Kurdistanâ Iraqê û yên Kurdistana Iranê bi taybetî ji Soran nayen besdar nabin. Gelo Fehmî Kakeyî ci izahî ji vê re-tîne. Gelo li gor wî di karûbaran wiha de kî pîr û kî hindik Kurperwer e?

Lî helbet em bi aqîlê Fehmî Kakeyî hukum nadîn û em dizanîn ku mesele ne hindik an pîrbûna Kurperweriya filan perçeyî yan ji xwediyê felan lehcîyê ye, sebebîni civaki û dîrokî yên ciddî jê re hene ku divê li ser wan bê lîkolîn û riya çareserîye bê nîşandan. Mesela ziman û lehcan ji her wek vê ye. Fehmî Kakeyî şerm bike ji, neke ji

Çi Kurmanc, ci Soran, ci Dimili û Hewramî yan Feyli, hemû zimanzan û nivîskar û siyasetmedarên Kurdivê li xwe varqîlin ku dane ser riyeckawa şâş û herkes dixwaze lehcâ xwe bike zimanê yekîrti yê Kurdi û bi vî awayî gav bi gav sê çar zimanen ji hev cihê peyda dîbin.

hin rastiya me Kurden hene, divê em wan veneşerîn û pozbilindî û queretiya vala nekin. Em Kurd perçekîr ne, tu caran dewleterka me ya serbixwe çênebûye; rî li ber pêşveçûna ziman û kultura me hatiye girtin. Dibistanen me, enstitü û akademîyen me, rojname û radyo û televizyonen me nînîn ku li seranseri welêt ji bo avakirin û pêşdestina zimanekî yekîrti yê nivîskar bixebeitin. Em di mesela hebûna lehcan û ji hev têgîhiştinê de ji gelek miletên dînyayê ji du sed salan zêdetir paşdemayî ne. Berê miletên din ji perçekîr bûn, gelek dewleterka piçûk yên feodal di nav wan de bûn, lehcen wan ji hev cihê bûn û zimanekî wan ê yekîrti ku hemû milet jê fam bike, tenebû. Lî begên wan, mîren wan, qîralen wan rabûn, bi ser û kuştin û zore be ji dewleterka xwe yên piçûk ên feodal di çarçeva milî de kirin yek, dewleta xwe ya milî ava kirin, lehcâ xwe yan a herêmekê ci bi zor û tîrsê be, ci bi imkana serdestiya xwe be û ci ji bi hîndekîyê be, bi hemû hemwelatiyê wê dewleterka qebûkîn. Dibistan vekirin, rojname û pîrtük çapkirin, di dezgehen dewleterka de lehce bi kar anîn, paşê radyo û televizyon û sinema û gelek tişten din derketin. Bi vî awayî

bo miletên xwe zimanekî yekîrti yê nivîskî durust kirin.

Lê rewş me wiha ye? Na. Em çar perçe ne, ji hemû dezgeh û imkanen hîndekîrî û ragihandinê bêpar in. Gelek lehcen me yên cihê hene ku bes li herêmên xwe naskîn ne, herêmên din hay ji van lehcâ nînîn. Heta cuðatî di nav lehcîkê bi xwe de ji hene ku însanen wê lehcê baş ji hev fam nakin. Em ne serbest in. Dîmin bi darê zorê zimanê xwe bi me dide hînkirin û dixwaze zimanê me winda bike. Vê yekî ji di mesela yekîrtina zîmîn de dijwari anîne pêşîya me.

Gelo di rewşek wiha de em çawa dikarin Kurden xwe ne Kurd û ne weletperwer ilan bikin ku çîma bi lehcîyek din nîzânîn, naxwînin û dibêjin ku xwediyê lehcek dinê ne. A xerab em çawa dikarin bixwazin rî li ber hîncen din bigrin.

Di rebenî û bêîmkanyeta wiha de gava em doza wek daxwazên Fehmî Kakeyî dike Kurden me dev ji a xwe ji û ji a me ji berdidin û bazzidin yan Erebî, yan Tirkî yan ji Farisi hîni zarokên xwe bikin. Kurdistana Iraqê nimûneyekâ ekşere ya vê trajedyê ye. Herêma Behdinan ji bo ku rî û imkana hînbûna Kurmancî li ber wan venebû, beren xwe dan hînbûna zimanê Erebî. İro li derveyî welêt ji, ji sergîjî û eşâ vê yekî û ji ber bindestiya li hember Tirkî, Erebî û Farisan malbatên me berê zarokên xwe didin hînbûna Erebî, Tirkî yan Farisi. Awayê berpêcûna yên wek Fehmî Kakeyî ji teşvik dîkin, zorê didin ku malbat ji bêçareyi berê xwe bidin riyeke wiha.

Fehmî Kakeyî di nivîsa xwe de pişte li ser wê yekî dîsekine ku siyasetmedarên Kurdivê li xwe varqîlin ku dane ser riyeckawa şâş û herkes dixwaze lehcâ xwe bike zimanê yekîrti yê Kurdi û bi vî awayî gav bi gav sê çar zimanen ji hev cihê peyda dîbin. Her wekî Fehmî Kakeyî idîa dike, Soran ji bo Kurmanci nabe bingeh, lê hemû zaravê Kurdi ji bo zimanekî yekîrti yê nivîskî dibin bingeh. A xerab em vê rastiye nabînin û gavê xwe li gor vê rastiye navêjin.

Di mesela xala sisîyî de Fehmî Kakeyî yekcar şâş e ku pêşîyâr dike ku ciyê Kurmanci nebe zarokên Kurden Kurmanci bila bi Soranî bixwînin. Carekê ev dûrî wê armancê ye ku divê zarokên Kurdi bi riya zimanê zîkmakî, hîsatir û zûtir hîni Swêdî û jiyanâ Swêdî bibin. Kakeyî wek mamostê ji bir dike ku bi zaravayekî ku meriv jê tê nagîhê (belki hema hema qasî Swêdî jê dûr) çava meriv hîni zimanekî biyanî bibe. Ev pêşîyâr wek wê yekî ye ku meriv bêje bila zarokên Kurden di destpêkê de dest bi hînbûna du zimanekî biyanî bikin. Ev nabe xwendin û nivîsina zimanê zîkmakî. Mesele ne ew e ku Soranî ji Tirkî xerabtir e. Lî em rastiye han wan malbatên bêçare, dixe nav trajediya ku dersen Tirkî, Erebî û Farisi ji bo zarokên xwe bixwazin. Ne ku xayin in, yan kêm Kurdin.

Tîşten ku Fehmî Kakeyî destnîşan dike, êş û derdîn miletê me ne, û ji bo çareserîkîna wan nabe ku em wek Fehmî Kakeyî, malbatên Kurdi súcdar bikin û ji wan hin tiştan bixwazin. Di vî warî de berpirsiyârîa pêşîn ne li ser milen wan, lê li ser milen hemû zimanzan, nivîskar, siyasetmedar û mamos-tê Kurden e û mesele giran û dûr û dirêj e. Mesele ya wê yekî ye ku em ê ji bo zimanekî yekîrti ku hemû Kurdi tê bigîhê ci rî û dirban bidin ber xwe, eme ji ku, ji kê, bi ci awayî dest pê bîkin û çawa bimesin.

Fehmî Kakeyî divê dev ji zirtêna vala berde, hewl bide xwe ji bo ku derd û êşen miletê xwe çetîr nas bike. Murad Ciwan

Genrek li nav sêrebirîndarêñ warwêran - V -

Murad Ciwan

Em têr ber koşkekê ku gelek xweşik û nazenin hatiye avakirin. Navê wê koşka Şehabeddin Çelebi ye ku ew bi xwe 1864'an de li Hewlîrê hatiye dinê. Niha ev avayı Muzeya Etnografi ye. Em diçin li hundurê wê digerin. Cil û bergen Kurdistan yên mili, alet û wasitên ku di jîyan, kar û kultura Kurdistan de hatine bikaranîn; haletên zîraî, pezwendîkirin û zeneetkariyê, firaqen xwarinê, kilim û xalî û xîşrên dawet û şâhiyan û gelek tiştîn din yan ew bi xwe yan ji modelen wan ên piçuk di muzeyê de hatine raxistin.

Kumekî şivanan yê ji kuvâku bi dîwîr de dardekiyî, gelek bala min dikişine. Wek fotêrê gundiyan Mekşîki ye. Tara dora wê gelek fireh e. Ez radikim didim serê xwe û rismekî pê dîkeşin. Pêşiyê ji min re hisek wilo çêdibe, ku ev di salêñ dawîn de ji Ewrûpiyan gihaştiye Kurdistan. Ez ji berpirsiyarê muzê dipirsim, dibêje "na ev kum kumê şivana ye ku li dora Silêmaniyê xelk ji kevin de didin serê xwe". Di vê navberê re berpirsiyar dide xwiyakirin ku gelek tiştîn muzê yên balkêşir, ji tîrsa talan û şîkandin û dîziyê hatine hilanîn, nuha ne li muzê.

Em hinekî din ji li nav kelê digerin, paşê vedigerin nik erebên xwe ku em dakevin nav bajêr. Li wir pêşmergan dor li eskerekî Iraqî girtine, him pê re diaxin him ji pê dikenin. Em pirs dîkin ku çi ye. Dibêjîn: Eskerekî Ereb e. Di nobetê de keleşkofa xwe daye dizin. Qumandarê wî ji ew qewirandiye gotiye ya here keleşkofekê bîne, yan ji ez ê him eskeriya te bişewitînim, him ji te şesh mehan têxim hefsê. Ew ji hatiye dixwaze yek xêra xwe keleşkofekê bidîyê da karibe ve gere cem qumandarê xwe.

Me esker bi problema wî re li wir hişt û em dakin sükê. Em cûn çend pirtûkxanan ku ji xwe re kitêban bikirin. Lê kitêben ku em lê digerian tunebûn. Peşê yekî pirtûkfiros, mukur hat ku newêrin kitêben hêja derxin binin pirtûkxanê. Got:

-Hîn ji em nizanîn ku cara çendan

wê dikanêñ me bêñ talankirin. Loma kitêben ku hûn dibêjîn di enbaran de ne û niha em nikarin wan derxin. Lê li nêzi avayiya mehkemê sikakê heye ku xelk tînin kitêben nuh û kevin li wê derê li ser cadê difroşin. Biçin wir, belkî kitêben ku hûn dixwazin li wir hebin.

Em bîryar didin ku pişî nîvîro bicin wir û diçin çarşıya sergîti ya Hewlîrê. Dikanêñ manîfature, yêñ dextûdan û buharatan, yêñ sebze, goşt û mast û penêr û yêñ din li wir in. Çarşıyek mezin a çend cade ye. Ser girtî ye, kuçen wê teng in. Xuya ye çarşıya herî kevin ev der e. Piştre em li erebên xwe si war dibin û ji bo dîtina Hewlîrê li sük û kuçe û mehelan digerin, her carê ji se riyekî em diçin serê din, paşê fettekê li dora wê dixin. Heta wextê firavînê bi vî awayî em li nav bajare Hewlîrê digerin. Wextê firavînê pêşiyê em têr ber avayıya Muduriyeta Muxaberata herêmî ku niha büye megerê merkezi yê pêşmergen cephe û Hewlîrê. Avayı hemû hatiye talankirin ji bili dîwâren hîş û rût tişt pê ve nemaye.

Boşahiya pêşmergan e li ber derî û di hundurê avahiyê de. Em diçin li ode-kê hinekî vedihesin. Piştre Mamoste Omer ji tê wir ji wir em ê bi hev re bicin malê.

Wali li ser tenekê rûdinê

Sohbeta me li ser bêserûberî û bêimkaniyê û nemeşandina kar û barê xelkî ye. Yek dibêjî ku:

-Ma çawa wê kar bîmeşin? Li wilayetê bi xwe ji tu tiştîkî ku nehatibe talankirin û şîkandin nemaye. Wali bi xwe li ser tenekê rûdinê.

Em ji bo firavînê diçin malekê ku ew ji biraziyê Xalit Axa ye. Xaniyekî yekqañî yê fireh û modern e. Dora wê bi hewşekê hatiye girtin. Hundurê wê bi mobilyayê hêja yên klasik hatiye dairtin airconditionek hundur hênik dike. Ji xwe di havînan de li van deran ne ji bawesîn, perwane û airconditionan be, ji germê li hundur debar nabe.

Firavîneca pîrreng a Kurdi tê ber meku kutikêñ birincê, pelén peçayı,

VEGER

Aliyekî dilê me bi hêvî, aliyê din bi pirsên biguman dagirtî ye



Kela Hewlîrê

goştê sorkirî, tîrşîk û birinc e; piştre xoşab û muhalebiyek bi lezzet tê ber me û meywêñ cur bi cur li pey wê tê. Paşya tevan ji çayeka teze ya bi dem tîhna nava me dişikine. Mamoste Omer û Xalit Axa bi rastî ji bo mîvanhîziya Hewlîriyan nişanî me bidin ci ji destê wan hatiye kirine û dîkin, heta bi derecek wiha ku em mehcûb dibin.

Pişti firavînê, Mamoste Omer di bêje:

-Ji bo iştîrahîtê rabin em bicin mala me. Çimkî di vê seêtê de nuha elektrik wê li vê semtê bê birîn, lê li cem me heye. Gava elektrik bê birîn perwane û aircondition kar nakan, hûn û ji german nikarîn li vir debar bikin.

Em diçin mala wan. Avayıyek ne qasî ya berê modern û nû ye, lê xweşik e û hewşâ wê bi darén hijir û mewen din xemilandiye. Di vê mehê de hijirên Hewlîrê gihaştine ji. Ji me re, ji dora hewşê hijiran tînin, em dixwin. Paşê em vedikîn ji bo iştîrahîtê, heta nêzi evarê, ku dinya hinekî hênik dibe, em xatir ji malê dixwazin û derdi Kevin sükê. Pêşiyê em diçin sükâ pirtûkfirosan, hin pirtûkan dikirin, paşê ji em

diçin qereqolekê, li wir hinekî li nik pêşmergen rûdînîn heta Xalit Axa hin karûbarêñ xwe xelas bike.

Pêşmerge li qereqolan

Pêşmergên partîyan, qereqolêñ Hewlîrê li gor semtan li hev parê ki-rine û ewleyî û aramiya her semtê ji hînan tê pirsîn. Cara pêşîn e ku pêşmerge rûbirûyî karekî wiha bûne. Ew pêşmergen ku li çiyê wek şeran şer dîkin, li vir ecemî û nezan xwiya dîkin, di biserxistina karan de zehmetî dîkşînîn. Pêşmergeyek dibêje:

- Heyra em hatine vir bûne no-bedarêñ jînên xelkê. Yek tê dibê mîrê min li min xistiye, yek tê dibê bavê min li min xistiye. Divê em herin malan, gîf û gazinan guhîrî bikin, yan wan li hev bînîn yan ji wan bigrin bînîn qereqolê têxîn nezaretê.

Pêşmerge, bi cîb û pîqabêñ sivil li nav bajêr digerin, problem li kîjan malê hebe bi wan diçin wir. Silehîn wan keleşkof, RBG û carna ji doçka ne. Tûte-tûta wan e, virde virde di-pengizin. Polisîn Kevin ji alî usul û informasyona karûbarêñ berê û burokrasîyê û tiştîn din agahdariyê di din wan, alîkariya wan dîkin.

Ber bi evarê, hîn roj neçûye ava, em radibin bi ré dikevin ku vegein Şeqlawâ. Saet berî şeşê evarê divê em ji hidûdê tequerawestanê derbas bin. Li gor lihevîrîn evarê ji şeşan pê ve divê cûnûhatin di navbera erdêñ azadkîrî û yêñ dagirkirî de çenebin.

Di vegevê de gava em têr qezâ Selahaddin em dibînîn ku tanken eskerî rî girtine û cûnûhatek de nav eskaran de ye. Li ser cadê teqereqa paleten tankan e. Gelek erebên sivil hatine sekinandin, rîz bûne. Xalit Axa ji şofêrî me re dibêje: "bajo pêşîya ereban". Ku em diğihîn pêşiyê, noxta kontrolê zabiteki bi rutbe û uniforma eskerî ya Iraqî dixwîyê. Yekî kej ê bejn zirav û dirêj e. Hê gelek xort e. Ku çav bi Xalit Axa dikeve ber bi me de tê, bi kîfxweşî silavê lê dike û bi Kurdiyeke gelek xweş û nazik dibêje:

-Mame Xalit baş bû ku ez rastî te hatim. Ji jér newalê telefon hat ji me

re, li Korê pêşmerge dixwazin bi zorakê ji kontrola eskerî derbas bin. Saet nêzi şeşan e, divê keseki ji wir ber nedîn. Lê pêşmerge qebûl nakan. Em ditîrsin ku şerek derkeve. Emir dane, me tank anîne serê rê. Xêra xwe tu xwe bigîhîn wan û ji wan re bêji ku bira paşde vegeerin.

Zabiteki lihevîfî û nazik e, Kurdiyek rewan ji devê wî derdi keve. Ne Ereb e, lê nizanîm gelo Kurd e yan Nastûriyê Kurdistanê ye. Xalit Axa soz didiyê ku muşkûle hel bike û em bi rîdikevin.

Gava em têr Korê ser hidûdê tequerawestanê, em dibînîn ku qereb-alîxek gelek zêde lê kom bûye, yêñ ku bi israr dixwazin derbas bin ne pêşmerge, lê Kurdîn sivil in. Eskeran ji xwe dane ber wan. Hema hema dike şer derkeve. Xalit Axa peya dibe ji sivilan re dibêje ku "vegeerin, zorê medîn eskeran bira tevliheviyek çenebe". Hin di ber xwe didin. Lê Xalit Axa bi qerardarî dibêje "na", pişti wê sivil piçekî vedikîn, esker ji hinekî rehet dibin. Hê ew bela nebûne em di nav wan re diherikin diçin. Gava em diğihîn Şeqlawâ, roj çûye ava, tarî ke-tye erdê. Em geleki sipasi Xalit Axa û Mamoste Omer dîkin, ew xatirê xwe ji me dixwazin û em ji hev vediqetin.

Em du rojîn xwe yên din ji li Şeqlawâ derbas dîkin. Di wan rojan de em nas û dostan ziyaret dîkin, xatirê xwe ji wan dixwazin. Çimkî me bîryar daye ku em ë ñ 26'ê mehê de vegeerin.

Veger

Serê siba 26'ê mehê, em bi otomobilekê pêşiyê diçin Diana, li wir ji berpirsiyarê partîyê pîqabekê ji bo me kirê dike û em bi rî dikevin, di riya xwe ya berê re vedigerin Zaxoyê. Gava em diğihîn Zaxoyê, nîvê şevê ye, em diçin megerê partîyê ku pişti vekişna eskeren mutefikan a ji Kurdistanê, anîne nava Zaxoyê. Avayıyek mezin a nûvakirî ye. Derî û pencerên vê avayıyê ji nînin, lê xwiya ye ne ji ber talanê, lê ji ber temamnebûna avakirînê ye. Wê şevê li wir em dibin mîvanê Mele Remezan, serê sibehê ji me re



Li Hewlîrê Qereqolêñ polîsan di destê pêşmergeyan de ne (Foto: Armanc)

Kurdistana Iraqê

cîhekî musaîtîr dibînin ji bo mayinê. Maleka nézî meger a halxwes e. Xwendiyê malê Xalit Axayê Sindî ye, berê yek ji musteşarên Zaxoyê bûye. Jê re dibêjîn Xalidê Şêxo. Şêxoyê bavê wî ji hê li jîyanê ye, lê gelek extiyar bûye. Xalitê Şêxo di serihildanê de ciyê xwe girtiye nuha jî li gel PDK'a Iraqê ye.

Çi dibin bila bibin, Kurd in, xwendan eşir in, qedr û qîmetê û rehetiyê didin mîvanê xwe. Em jî li mala wan vê qedr û qîmetê û xizmetê dibînin.

Çima Saddam nakujin?

Xalit jî bavê wî jî gelek caran tênik me, em ji dînyayê, ji halê Kurdan sohbet dikan. Xalit bixwe, wek ku li ser êgîr be, di ciyê xwe de nasekin, tim di qile-qilê de ye ku çima Amerika û mutefikan heta nuha Saddam ji ser hukum nexistine.

Wan rojan jî Amerika cardin heta 25'ê mehê mudetek daye Iraqê, ku agahdariyî li ser çekîn xwe yên atomî dernexe û rî li ber pisporê NY veneke, Amerika dibêje "ez dikarim carek din êrîşê bibim ser Iraqê". Lê 25'ê mehê hatîye derbas bûye, iro 27'ê mehê ye, hê jî tu deng ji Amerika nayê. Xalit bi vê yekê gelek nerehet e. Dipirse:

-Ma gelo çima heta nuha Amerîkiyan li Saddam nexistin? Ez dibêjî:

-Edî teyarê Amerikayê nema êrîş tînin ser Iraqê û Bexdayê. Ger di nav ordiya Iraqî de yekî bibînin û bi înqilabek hundurîn karibin Saddam bixînin wê, wê çaxê wî bixînin, yan na heta rojek wiha wê Saddam li ser hukum bimîne.

Ev pevya min yekcar pê nexwêstê, nerehetî û qil-qila dilê wî zêdetir dice. Dibêje:

-Ma wiha dibe. Heta kîngê wê weha bajo. Xelk perîşan e, bê hal ketîye, sebir û taqt pê re nemaye. Rojekê zûrî dirvê çare jê re bê ditin.

Xalit Axa ye, bi salan musteşarı (serokcahîşti) kiriye û paşê berê çekê Saddam daye ordiya wî û serî hil-daye. Baş dizane ku idî nema Saddam baweriya xwe bi wî tîne. Eger sax û li ser hukum bimîne, peymana otonomîyê jî bê îmzekerîn, kijan rojê Saddam keysîs lê bîne, wê derbê lêxe. Loma jî hêviya wî ew e ku rojekê zûrî Saddam bê kuştin ew û yên wek wî karibin bîhneke rehet vedin û li mala xwe rûnîn. Ew dibêje "sebra xelkê nemaya", lê ji herkesî bêtir ya wî nemaye.

Ma parti çi ne

Bavê Xalit jî hay ji mahna vê serihildanê heye. Heta xwiya ye piçekî posman e jî ku ketîne serihildanek wiha. Dibêje:

-Welle mal û mulkê me hebû, perê me hebû, çekîn me li milen me bûn, hukmet ji me re gelek baş bû, lê em rabûn me hemû bin pê kirin û serihilda. Esas yên ku serî hildan û dewlet qewirandin ne parti bûn, em musteşar bixwe bûn. Ma partîyan ev panzde sal in çi kirine, çi qeweta wan hebû ku serî hildan. Lê di van panzde salan de yên aîkariya wan dikirin, xwarin û hewandina wan dikirin, fişekîn wan didan dîsa em bûn, iro jî me serî hilda. Tevî vê jî kes nayê li halê me napirse, nabêje "ka felankes tu çawayî, tu daxwaz yan muhtaciyeq te heye ya na". Di ser re niha jî cardin ez aîkariya wan dikim.

Mamê Şêxo dixwaze bide diyar-kirin ku esas çi bûbe wan kiriye û parti jî hatîne li ser rûniştine. Ew bi xwe jî tarûmar bûne. Carekê wiha ji dibêje:

-Axir Barzaniyan(qesda wî eşîra Barzaniyan e) bi a xwe kirin, em jî kirin wek xwe. Mintiqâ Barzan ciyayê asê û gelîyê kûr tê de ne. Ne jî çandîniyê re ne jî ji pezxwedîkirin re dibe. Loma ji hebûna Barzaniyan, hew dendikên kerengan û kizwan bûn. Sibê heta êvarê li wan şaxan li pey komkiranâ dendikên kerengan û kizwanan bûn. Çavên wan bar nedikir ku warêne me û yên eşîren din jî yê wan bi xérûbêrtir in. Rabûn serî hildan, nerehetî peyde kirin, geh li vir xistin geh li vir xistin, heta ku em hemû kirin wek xwe reben û perişan. A va ye em hemû bûne wek wan.

Serê siba 28'ê mehê, Xalit Axa gava tê "rojbaşiyê" li me dike, bi nîv-henekî û nîv ciddî dibêje:

-Malavano, işev pê de xire-xira we ye hûn radizin. Ne xew ne jî tebat ketîye me.

Em meraq dikin, dipirsin:

-Çima, xêr e?

Dibêje

-Lê, do xeberek hat ku Saddam ji Müsilî ordî xistiye teherukê, ber bi bakur de tê. Me xwest em rastiyê fêm bikin. Virde wirde em pengizîn. Em dixwazin piçekî dilê wî rehet bikin, loma em dibêjin:

-Na, na Saddam niha newêre berê êrîşa xwe bide Kurdan. Û nikare jî.

Lê roja 28'ê mehê qilegil ne di Xalidê Şêxo tenê de bi partî, pêşmerge û sivîlên xwe ve di hemû Zaxoyiyan de ye. Xebera teheruka ordiyê ji aîl Musilî ber bi bakur de li herderê belav dibe.

Em xatir ji mazûbanê xwe, duvrevi jî nas û dostêne wir û ji berpirsiyaren partiyê yên wir dixwazin, gelekî sipasî wan dikin û teví çend pêşmergan berê xwe didin ser hidûd; ber çemê Dicle. Hê em negîştine Dêrebûnê pêşmergeyek pikaba me disekinîne, dibê ku hin gulên topan hatîne li pêşîyê ketîne, me ji bo keşfê mufrezeyek şandiye, bisekinîne heta cewab tê. Pişti çend deqan hin têne lê em tu agahdariyek eşkere û durust ji wan nastînîn û li riya xwe dewam dikin, diçin Dêrebûnê. Li wir topek ditege ku gula wê li pala ciyayê Dêrebûnê dikeve. Hin dibêjin, ordiyê ji Musilî ev top avêt, hin ji dibêjin "na ev pêş-merge ne, tatbiqatê dikin". Lê rastî çiye, kes nizane. Em ji wir bi rî dikevin têne ber çem. Seet li dor yekê wê dora me were em û ji çem derbas bin. Em xwe dixin bin siya hohikekê.

.....

Pişti gera xwe ya nézî mehekê, va ye em Kurdistana Iraqê li pey xwe dihelin û derdikevin derva. Dilê me wek roja pêşin ya hatîne Kurdistanê ne bi gurpe-gurp e. Dilekî rawestiyayî, sakîn e, alyek jê bi hêvî, lê alyî din mehzûn û bi xem û xeyalîn bigûman dagirî ye. Ez dilrehetiyek fikirzelîfî û pêşibironahî û xwe de nabînim. Erê havîn e esmanê Kurdistanê çik sayî ye, lê qije-qija tava havînê, keldûman, xumam û leyelanek avetiye ser axa Kurdistanê. Pêşeroja Kurdistanê di nav vê keldûman û xumamê de hêl dibe, geh bi dûr dikevin ji ber çavên min winda dibe, geh nêz dibe, bayê hêlbûna wê tevaiyya nuh û canê min dalêse hêviyê zelal û tîhîşkîn û dîlxweskîr di min de peyda dike. Bêçare divê em rabin bi rî kevin. Xuya ye hê rîwîtiyek dûr li pêşîya me ye. Cara dawîn ez li paş xwe dizîvirîm û di nava xwe de dimîrim:

De niha bi xatirê te Kurdistana Iraqê!


De niha bi xatirê we

Şerebirîndarêñ warwêran!

Dawî

Piştî Donzdeh Salan

Abîde Diyarbekirî



"Ew xanîyen kevin yên bi kevirên reş û hewşen mezin ci bigre nemane"

Ofisê ji mirov jîyana modern dibîne. Berê tê bîra min, daristan û basxê û hişinayıya Diyarbekirê gelek bû, lê nuha qet tu tiştek jê nemaye. Çemê Dicle ku bi zarotî em diçünê, me tê de masî digirtin, nuha ji ber gemar û pîsiyê mirov nikare xwe nézî we bike, ji xwe ava wê jî pirr nemaye.

Ji alî mîmarî ve ji Diyarbekir pirr xerab bûye. Ew xanîyen kevin yên bi kevirên reş û hewşen mezin ci bigre nemane, di şuna wan de apartmanen pênc-şes qatî bilind dibin.

Pişti demekê ez cûm gundekî nézî Diyarbekirê ku nave wê "Bedûlî" ye. Li wir hînek heval û merivén min hebûn. Em çûn oda gund. Gelek kes hatin, wek suhbetên berê wan dipirsî û min ji bersiv dida. Li vî gundi li her malê bûzdolabî, televizyon, bawesîng (vantîlator) hebûn. Tişte ku balkê bû, herkesî digot "Em Kurd in." Û xeberên televizyonê jî gor xwe analîz dikirin. Tê bîra min 15 sal berê dema em diçün gundan, gundiyan hay ji pîrsatetewi û pîrsen xwe yên civakî tubebûn, lê nuha tam eksê wê bû, ew bi xwe édi li mesela xwe xwedî derdikevin. Gundîyan bawerî bi serketina milletê Kurd dianîn, lê giliyê wan ê herî mezin ji ew bû ku çima Kurd bi hev re kar nakin, çima em nabin yet.

Pişti nimêja Xutbê em ji gund derketin, me berê xwe da Dêrikê. Paşê em çûn gundekî nézî Dêrikê. Em wê şevê li wî gundi man. Evarê gelek kes hatin. Disa wek suhbetên berê. Pişte me behsa kar kir. Ji vî gundi gelek xort çûbûn hîla Tîrkîye kar dikirin. Hînek çûbûn mintiqâ Behra Reş, findîqa berhev bikin. Tişte min dît, Tîrkîye ji wan re bûye wek Almanyayê. Ji her malekê muheqqeq yet li hîla Tîrkîye kar dike. Zivistanan jî vedigerin gundîn xwe. Bê guman hînek ji wan li wan derana bi cîh jî dibin.

Em serê sibê rabûn, emê biçûyana Qezê (Qiziltepe), Em di riya Wêranşahre re ber bi Qiziltepe bi rî ketin. Lê nézî bajêr kontrol hebû, ketin û

derketina bajêr qedexe bû. Çimkî wê rojê esnafan hemûyan ji bo protostokirina zuîma hukûmetê dikanen xwe girtibûn. Polisan ji bi zorê dikanen wan vedikirin. Neyse, em bi paş de vegeriyen û me berê xwe da Diyarbekirê. Li gor bajar û qezayen derdora Mêrdin û Sêrte, Diyarbekir pirr bêdeng û sakîn bû. Çimkî li van derana şerekî eşkere hebû. Eynî wek Lubnane.

Li Diyarbekir min gelek hevalen xwe yên kevin cîtin. Me munaqşeyen siyasi dikir. Piranîya wan li hember hevalen li derve bûn. Çimkî bi ya wan yên li derve hemû kadroyen bi tecrube ne, lê ci heyf ku keda xwe li Ewrûpayê dikujin. Mesela hînek dîgot ger hevalen li Ewrûpayê vegerin welêt, rewşa siyasi ya welêt bê guman wê ne weha ba. Wê feydeyek gelek mezin bigîhandana vê rewşa me ya iroyin. Çimkî him tecruben wan ên vê derê û him jî yên Ewrûpayê hene. Yanê bi kurtî digotin, eger hûn dixwazin di vî şerî de hebin, dîv hûn werin welêt.

Rojén min hindik mabûn. Min xwest ez li ser problemen ciwanan lê-bikolim. Lê min pêre negîhand. İro li Diyarbekirê qismek ji xortan ketine riya xerab û krimînel. Min du xort ji mehella xwe nas kirin, herdyan ji eroîn bi kar dianîn. Bi wasita wan min hin eroînmanen din nas kirin. Berê li Diyarbekir esrar hebû lê, eroîn pirr kesî bi kar nedianî. Lê nuha xort eroînê bi derziyan li xwe dixin. Min qet bawer nedikir, lê wexta ku min bi çavên xwe dît, ez ecêbmâyî mam. Çimkî derzî bi piranî li welatên Ewrûpayê têbî kar anîn.

Li gel hemû van pîrs û promlem û nexweşîyan, ez bi kîfxweşî ji welêt vegeriyam. Hêviya min a ji bo azadiya welêt bêtir bû. Çimkî ferqek mezin a ji 12 sal berê ew bû ku her kesî digot "Ez Kurd im!"

Çirok

Dema min dest bi bazdanê, bi revê kir, min yekcar nizanibû ku ez dê wilo dûrî malê biçûma. Xwêdan ji hemû canê min diherikî û ya ku ji eniya min dihat xwarê çavên min dişewitand. Dilê min dikir gurpe gurp û dikir ku ji sînga min derketa. Ez ji ber kêt direviyam? Tîrsa min ji çi bû? Ez ji ber her tiştî direviyam û hemû hawîrdora min tîrsa mirinê berdida nava min. Berî Helebçeyê agir, piştî Helebçeyê agir û hemû dîroka Helebçeyê de agir... Helebçe agir, ateş, ar, ardû. Helebçe herdem di dilê ba û boranê de. Helebçe her tim di bin barana mirin û mal-wêraniyê de...

Xwendavanê hêja, guhdarê berêz! Min ji bîr kir ku ez xwe bi we bidim naskirin. Ez hêvîdar im ku hûn dê li vê kemasîya min bibuhurin. Hişê min yekcar nemaye. Ez her tiştî ji bîr dikim. Serê min mîna bêjingê, mîna seradê ye û tiştîk tê de namîne. Eşa min, derdê min, dostên pir hêja, ew e ku ez bêhiş im, kembîr im, û di serê min yê bê meji de, tu tişt xwe nagire.

Di reva xwe de, min piştâ xwe dabû welatê xwe, welatê derd û kulên bê serî û bê binî û min berê xwe dabû welatê xerîbiyê. Mîna hemû bêwela-tiyan, bêcî û bêwaran, min di xwest ku min piştâ xwe bida dîwarekî ne ketî. Li ser rê, di nava newal û çiyan de, nîşanine gilover yên sê niçik hebûn û wan berê min ber bi xelasiyê, ber bi jîyan û azadiyê ve dikirin. Li ser wê riya han, nîşanekekî ez sipartim nîşanekekî û çiyayekî ez dam çiyayekî, ta ku ez rastî bajarekî mezin hatim. Erê ez hîn ji bajêr pirr dûr bûm, lê min nas kir ku wan nîşanan berê min ber bi wî ve dikirin û dixwestin ku ez li wê derê bi cî û war bibûma. Bi tîrs min li paş xwe nîhîrî û dema ku min nema pêjna leşkeran bihîst, bêhna min hînekî fireh bû û min ji hemû canê xwe xwest ku bawer bikira, ku min xwe gihandibû bendera xelasîyê, warê jîyanê. Min ji binî ve nîkaribû bawer bikira, ku li ber dergehekî ji dergehîn wî bajare hanê, pir tişt dê werin serê min. Li gor nîşanan, ez ji nav pencen mirinê filîtibûm, û wek lawikê navpêçekê ku devê xwe ber bi pêşîren gilover û mişt şîr ve bike, min ji berê xwe ber bi çavkaniyê xweşîyan ve kiribû.

Lê ji ber ku ez di nava mirin û bêxwedîka tîrsê de rabûbûm û bi hezaran caran ez û mirin em rastî hev hatibûn û wê destên xwe dirêjî canê min kiribû, loma jî ez hîn jî dilbitirs bûm û dilê min nediket cih. Min xwest ku şevê perdeya xwe ya reş li ser rûyê cihanê raxistiba da ku min berê xwe bida bajêr. Lempeyê malan jî dest pê kirin,

Serê ku her tişt ji bîr dikir

Kurdo Husên

piştî lempeyêن cadeyan vêke-tin. Li gor wan nîşanêن li ser rê, li gor wê aramîyê, wê bêden-giyê, li gor wê ronahiyê şehr, tîrsa min bêmane bû, ne di ciyê xwe de bû. Ez bi xwe gihaş-tibûm welatê kelehanê kevnare, cihana xwarin û vexwarina xweş, navenda jîyan hêsan û bê serêş.

Ez hînekî din mam, heta ku lempeyêن bajêr di tarîya şevê de xweş xuya kirin. Şev hîn bi hîn diket û wê, perdeya hêminiyê û bêden-giyê li ser rûyê cihanê radixist û hîn bi hîn tîrsê jî xwe ji nava min ve kişand. Wîlo jî, ez ji nav çiyan derketim û min berê xwe da bajêr. Min destê xwe di ser serê xwe re bir û porê xwe rast kir û bi tiliyên xwe şeh kir. Riya min dirêj bûbû û di dilê xwe de, min ji xwe re xweş dikir û got: "Hema ez bigihêjîm bajêr, ezê serê xwe bişom, têkevîm nav ava germ, riya xwe kurr bikim û hînekî ji xwe re razêm". Min wîlo dilê xwe bi textekî nerm û germ xweş dikir, dema, li ser wê axa rast, di navbera çiyan û bajêr de, di dawiya wê roja han de, teqînek gîhaşt guhê min û guleyekî ba qelaşt û di sînga min de cû xwarê. Belê, di sîngê de û ne di piştê de, çimkî ez ji leşkeren dijmin pirr bi dûr ketibûm. Berî ku ez bi ser dev de herim xwarê, guleyekî din berê xwe ber bi sînga min ve kir û ciyê xwe di dilê min de kola, çê kir. Piştî van herdû guleyan, tişt pirr tevlîhev bûn û serêşan wek libêñ tizbiyê dan dû hev. Ji min nepirsîn çawan wan tîstan, wan bûyeran ez xis-tim nav lepêñ xwe. Min bawer dikir ku ez geleki dûrî pencen mirinê ketibûm û ez ketibûm nav jîyan rast, nav kaniya hê-viyê. Min ji xwe re got ku ew teqîna han, li ber dergehîn bajêr teqînek ne di ciyê xwe de

bû. Wîlo jî, min naskir ku ez ca-rek din jî hatibûm xapandin. Erê, gazinan ji min nekin, xwendavanê delal, guhdarê hêja, ez herdem ji bîr dikim ku ez têm xapandin. Ez bêhiş im û tiştan zû ji bîr dikim. Serê min wek bêjingê ye û serpêhatiyê mezin yên bav û kalan tê de namînin.

Leyse! Li ber dergehekî ji dergehîn bajêr, ez bi ser dev de cûm xwarê û di nav xwînê de gevîzim. Ez li ser axa rast dirêj bûm û min ji xwe re got ku Xwedê kir ku guleya pêşî di movikekî ji movikêni piştâ min de cûbû xwarê. Eger ne wîlo baya, wê bibaya car-cara min di dawiya wê roja han de. Guleya pêşî, wek derziyek bencê, hemû canê min pûc kiribû û min nema dizanibû êş ci ye? Çiqas wext derbas bû? Çend seet, çend roj, çend sal, çend sed-sal buhurîn? Lê xwendavanê kurteçiroka min, guhdarê çiroka min, hûn dizanîn min di wê rewşa dijwar de, di wê malwêraniyê de ci xwest? Hûn dê helbet bibêjin "Qûna tazî tembûrê dixwazi", erê min xwest ku ez ne bi ser dev, lê belê bi ser piştê de biketama. Eger ez bi ser piştê de ketibama, min dê wek di şevênen welêt de, ew şevênen berî qirkirina Helebçeyê bi bombeyen kîmyayî, min dê di asmanê sayî de bi kîfa dilê xwe li stêrikan, li heyvê binihîriya. Havînan, di germa şevê dirêj de, xweha min, dema, ez zarok bûm, cihê min li ser banê xanî, di bin asmanê mişt stêri-kên hûr û mezin de, radixist. Min xwe li ser nîvînan dirêj dikir û serê xwe datanî ser herdû destên xwe. Xewê zû bi zû zora min nedibir û bi hêsanî nîkaribû xwe berda nava çermokên çavên xwe. Min bi hînekî, stêrik dijimartin, erê ez dibêjîm "bi hînekî" ji ber ku li welatê min, Xwedê jî nikare

stêrikan bijimêre. Ez û heyv, em bûbûn dost û min pîr tişt xwe ji wê re digotin.

Belê, dema ku ez li wê axa wek rûyê dest rast ketim, min pîr dixwest ku min bêhna xwe bi dîtina stêr û heyvê fireh kiri-ba. Lê bextê, bextê reş hişt ku ez di nav xwîna xwe de, li ber dergehîn bajarê xelasê, li ser zik bîmîn. Ez wîlo mam heta ku pêyîne giran di nav gîhayê dirêj de nêzik bûn. Li ber dergehîn bajarê azadiyê, pena-hindeyê, mirovek li ser serê min rawestiyâ û min di dilê xwe de got ku hebe nebe, ev mirovî han wê, kesê ku lûleya ti-fenga xwe ber bi sînga min ve kiribû û ez li ser axê wek ter-mekî rast kiribûm be. Wî mirovî, piştî ku dît deng ji min ne-hat, destê xwe avêt milê min û ez bi ser piştê de qulubandim. Xwedê kir ku çavên min vekirî mabûn û wîlo jî, min li rûyê wî mirovî nîhîrî. Xwendavanê min, guhdarê berêz, herdem dema em li ser mirovuj, kuş-dar û xwînrejan diaxifin, em wan rûtîş, rûtahl, nexweşik di-bînîn. Tiştê ez dixwazim di der-heqa vê yekê de bibêjîm ew e ku ew mirovê ku li ser serê min rawestiyâbû pirr lihevhatî bû, xweşik bû. Dirûvîn wî ne yên kuşdarân bûn. Min helbet di-zanibû ku van nîşanênil gîlover û sêniçik ez xapandibûm û berê min dabûn mirinê. Lê min nîkaribû bigota vî mirovî gelo xêra min, yan mirina min di-xwest. Min ji xwe re got ku vî kesî nîkaribû mîşek bikuşta. Lê ew li ser serê min bû û berê lûleya ti-fenga wî di sînga min de bû. Bê ku gotinek jî ji nava riya wî ya dirêj derkeve, xwe bi ser min de xwar kir û destê xwe di ser serê min re bir û anî. Wî serê, min xist nav herdu de-stên xwe û di nava lêvîn xwe de bişirî, dema dît ku xwîn ji serê min nedihat. Çavên wî yên şîn di paş camênil gîlover de pirr dilbir bûn. Paşê, wî kî-reke devtûj ji kembera xwe derxist û ew di ser neynûka xwe re bir, û destê xwe danî ser çavên min û berî ku deng ji zengelolka min derkeva, wî serê min ji gewdê min birrî. Ez yekcar bi eşê nehesiyam, ji ber du tiştan: yekem ew guleya ku di piştâ min de bû ez pûc kiribûm, duyem, destê wî mirovî sivik bû, destê hosteyan bû û kîra wî di qirika min de cû xwarê wek kîreke tûj hirmiyekê bike du perçê.

Li wê derê, li wê navbirê, li ser wê axa rast ya di nava çiyan û dîwarêli hawî-dora bajêr de laşê min yê bê serî ji gur, rovî û keftaran re ma. Wî mirovî ti-fenga xwe avêt milê xwe, serê min xist tûrîkê xwe û berê xwe da malê.

Mal, bixwe, ne wek hemû malan bû û ji ber pirbûna pirtûk, belgehîn şûşen tenik û

xwe wek maran li hev dipê-çandin, min nas kir ku mal mala mirovekî pirr zana, nijadnasekî navdar bû. Min xwest bi wî re bipeyiviyama, çend pirs jê biki-rana çend pirsên girêdayî bi rewşa me ya kembax û dijwar û bi wan balefirê ku mirin li He-lebçeyê belav dikirin û gund û bajar qir dikirin... Min dixwest li ser wan nîşanênil ku li ser rê bûn bipeyiviyama. Lê wî zane-nasî hema rûyê xwe dûrî rûyê min dibir, xwe vedîart, piştâ xwe dida min, nedixwest çavên wî li çavên min bikevin.

Eşkere bû ku wî zaneyî guh nedida li derd û kulén min û ew bi karê xwe ketibû. Wî di-zanibû ku pirsên min pîr bûn û wî xwe dabû aliyekî, berê xwe dabû kargeha xwe. Wî agir dadabû, û bibû pelqa pelqa av û dermanen di şûşen xwaro maro de.

Xwendavanê hêja! Guh-darê delal! Ez nîşanîm çîma min xwest ku ez rûyê dê, bav, xwiş û birayê xwe bîbînim, dema wî rahişt min, rahişt serê min û ez xistim leganeke fireh a ji camê, di nav ava ku bi hêrs dicoşıya, dike-liya. Ez ji bombeyen kîmyawî filîtibûm û wîlo jî, di nava der-manen kîmyawî de, por, mi-jank, birhû, çermê rû û goşt bi min ve neman. Min nema ber xwe dît û di qulén çavên min re, di firnekên bêvila min re, di guhênil min re hemû mîjîyê min bê wek avê û ew jî di nav der-manen kîmyawî de ji hev ket, heliya.

Piştî demekê, wî mirovî agir vemirand û ava ku dikir pelqe pelq, sar bû. Wî lepikek xist destê xwe û ez ji nav avê der-xistim. Wî qafê serê min, kiloxê min yê sipî danî ser maseya xwe û di nava pirtûk û belge-han de cî ji wî re çekir. Wî bi kîfîxwesi paşê destê xwe di ser textikê eniya min re bir û anî û tiliya xwe di ser derzan re gerand.

Xwendavanê hêja! Guh-darê vê serpêhatiyê! Ez serê we gêj dikim û bi ser de ji, ez gotina xwe bi cih nakim. Min got ku ez dê xwe bi we bidim naskirin, û min ji bîr kir. Lê wek ku hûn xweş dizanîn, ez bêhiş im, zû tiştan ji bîr dikim. Serê min bê meji ye û wek bêjingek qul, mezin vala ye û tu tişt xwe tê de nagire. Xwe hînekî ragirin! Ez dê ji we re bibêjîm ez kî me eger ez xwe vê carê, wek car-en din ji bîr nekim, eger hisê min bê serê min. Belê, dema min dest bi bazdanê, bi revê kir, min yekcar nîşanibû ku ez dê wîlo dûrî malê biçûma. Xwêdan ji hemû canê min diherikî û yan ku ji eniya min dihat xwarê çavên min dişewitand. Dilê min dikir kurpe kurp û dikir ku ji sînga min derketa. Ez ji ber kêt direviyam? Tîrsa min ji çi bû?

Bi kevnewarên Kurdan yêni li rex û rûyêni çemê Feratê:

Dîroka însaniyetê ji nû ve tê nivîsandin

Dîroka medeniyetê ji Kurdistana dest pê dike. Newala Çorî wek yekem ciyê ku însaniyet ji barbaryê derbasî jiyana akincibûnê (xwecihiyê) bûye, tê hesibandin.

Berî ku sirra bajêr bê zanîn bajar wê di Gulana 1992'an de di bin ava "Baraja Ataturk" de bimîne.

Roza Dilan / Diyarbekir

"Pîrejina li Newala Çorî xweçih, van rojêni dawiyê qet ji mabedî (ibadetxanê) dernalave. Li ber heykelê Xwedayê Bereketê ku di formê jineke ducan de ye, lavelava wê ye, jê dixwaze ku ji xelayê re gareyekê peyda bike. Pîrejin dibêje: "Xwedaya min! Tu mezin e. Tu bereketê dixwazî, rî li ber xelayê bigre! Nehêle ebdêne te ji birçina bîmrin!"

Ev bûyera ku em pê bawer nañin, li gor Profesor Hautgman û kolanê arkolojik, di navbera Sêwrek û Hilwanê de li Newala Çorî 8000 salan berî miladê perçeyek ji jiyana rojane bû.

Bajarê li Newala Çorî ku 1 km ji gundê Qantara û 2 km, ji çemê Feratê dûr e, bi serokatiya arkeologê Elman Prof. Harold Hautgman û 20 arkeologên Elman pişti xebata 6 salan hat ditin.

Prof. Hautgman dide xuyakirin ku wî bi xwe li Filistîn, Suriye, Bakurê Iraqê (Kurdistan) û li Tirkîyê serokatiya kolanê arkeolojik kiriye "lê" dibêje Prof. Haugtman "li tu cihî tiştîn ku me li vir dîtin, weha ez ecêbmayî nehistime".

"Mabeda ku mirovan zandegirtî dihèle"

Li gor Prof. Harold Hautgman li gor wê demê mabedeke pir me-

Profesorê Elman Hautgman dibêje "Eger li Ewrûpayê cihekî weha di bin avê de bimaya wê xelk daketi ba kolanan".

Hat zanîn ku berî mîladê bi 8000 salan mirovân herêmê Xwedayê jin dihebandin û goştê beraz dixwarin.

zaîkekê ku kevirê kils jî tê de, hatiye raxistin. Me busteke nîvçûçik û nîvzilam û heykelkî mezin ê jinekê ku jê re 'Xwedana

plastik çiqasî pêş ve çûyî bûye". Li gor tê gotin Berî Mîladê (BM) bi 8000 salan li Nawala Çorî qonaxa serê serdestiya jin û



Haugtman: Çawa Misilman ji bo çûna hecê diçin bajarê xwe yê pîroz Mekkê, wê demê mirovân li derûdora Firadê ji dijîyan dihatin Newala Çorî. Lewra ji medeniyet li vir dest bi pêşketina xwe dike.

Berketê' iê gotin, dîtin".

"Li Newala Çorî di bin her kevirî de, me masken van heykelan dîtin. Ji bili heykelên biçûk ên


peyayan hatiye jîyîn.

Li gor Prof. Hautgman hebûna busteke nîvçûçik, nîvzilam û hebûna heykeljî jineke ducan gelik tiştan ifade dike:

"Her weki çinîn, kedîkirina nebat û anîna zarakan, neçîrvanî hînge pîrr girîng bû. Ji heykelên nîvçûçik-nîvzilam xuya dibe ku mirov û tabiet di nav zikê hev de jiyane û dibe ku vê yekê jî perestineke sîhira nîçîrê ku mirov û heywan gîhandîye hev, peyda kîrîbe. Heykeljî jina ducan jî delîl e ku çinîn hîn jî wek encama parkirîna kar, girîngiya xwe diparêze; ji bo çinîn û neçîrvanîyê pêwîstî bi zêdebûna mirovan heye û zaro-kanîn jî xususiyeteke girîng a vê qonaxê ye".

Serdestiya peyayan bi pêş dikeve

Li Newala Çorî pîroziya jînê tê parastin, lê bi neçîrvanîyê pîroziya peyayan jî dest pê dike. Prof. Hautgman dibêje: "Hîngê ev herêm pîrr bi daristan bû û li deverê hîrc, gur, gîr pîling, panter, gakovî û xezal pîrr bûn. Peyan



Prof. Haugtman: "Eger ev cihê ku ji şûnwarêni Jeriche yêni li Filistînê jî kevintir û girîngit li welateki Ewropî bûye, ji ber ku di bin avê de nemîne wê mirov daketibana kuçe û kolanan. mirina xwe didan pêş û neçîrvanî dîkirin. Ev jî bere-bere serdestiyê dide wan. Di hestiyen peyayen ku

nim, nîsk, nok, û ji zirfindeqêñ ku me dîtin, diyar dibe ku kedîkirina pêşî ya nebatan li Newala Çorî çêbûye. Anglo heta derecekê warê pêşî yê medeniyetê Newala Çorî ye".

Şûna pez mirovan dikin qurban

Li maleke mezin, di gorrek de me kurekî qurbankirî dît. Prof. Hautgman dom dike: "Dema ku em zanîn û tecrûbeyen xwe yêni ji kolanen li Iraq û Filistînê, bi tiştîn li vir hatine dîtin zêde dîkin, em acêbgirtî namînin ku çawa mirov hatine qurban kirin. Di karê kolanê de em zêde rastî gorran nehatin. Lî li gor encema kolanen li dor û bera çiyayen Zâgros, hat zanîn ku Berî Mîladê di salen 7.000'an, 8.000'an de dema daxwaz yan niyetek mirovan bi cî dihat lawekî xwe ji Xwedayê xwe re dîkirin qurban.

Li pêş çavêni me dîrokek tê kuştin

Cîma mirovan terka Newala Çorî dane, heta nuha jî nayê zanîn, û li gor Prof. Haugtman bersîva vê pîrsê kolanen arkeolojik yêndüvdirêj pêwîst dike. Bi ya Prof. Haugtman dibe ku ji ber 3 sedema bajar hatibe terkkirin.

Yekem; yan, wekî ku ji navê cih xuya ye (Newala Çorî; Newala Nêxweşîyan) bi guherîna hewayê, li herêmê nexweşîyek peyda bûye, piraniya mirovan mirine, yêni mayî jî cih berdane.

Duyem; yan herêm bûye qada serekî mezin yê serdestiya qonaxa patriarchal û matriarkal.

Seyem; yan jî mirovan cihine baştır ji xwe re dîtine û Newala Çorî têra wan nekiriye, barkirine, çûne.

Lê bajar berî ku sirra wî bê zanîn, di Gulana 1992'an de di bin ava "Baraja Ataturk" de dimîne. Prof. Haugtman li ser vê yekê weha dibêje: "Eger ev cihê ku ji şûnwarêni Jeriche yêni li Filistînê jî kevintir û girîngit li welateki Ewropî bûye, ji ber ku di bin avê de nemîne wê mirov daketibana kuçe û kolanan. Li pêş çavêni me dîrokek tê kuştin. Lî emê disa jî ji bo dirêjkirina emrê bajêr, deverê bi qûmê binixumin. Belki ji bo arkeologen bê, di bin avê de tiştin bimînin".



zin û muhteşem hatiye dîtin ku mirov baweriyê bi çavêni xwe nayne: "Zemîna Mahedê bi mo-

kevirin, cara pêşî em rastî heykelîn mezin jî hatin. Ev jî xuya dike ku li Newala Çorî sin'etê

GAMA VERÊNÎ

Roşan ROŞN

V
Semedê hadirekerdişê yew cîpi û çiyanê binan mi vengda katibi da. Dim a mi hakim dî, te de qalî kerd û mi doktori rî xeberi erşawiti. Senî ki ez vana, mi dîna-dar di bawer nêkerdîni ki yew başçawişê dewleti mîrdimanê bêguneyan kişeno. E, ray-ray ta'da şari bîni, sey heme kesi ma zî ina ra bêxeber nêbi. Feqet inê cayan di indi ta'da bîbi normal û destê ma ra zî çiyê nêameyni.

Kirra qalî, ez, hakim, doktor, katib û şoforê ma, ma rayîr kewti şî. Serê şanî ma dêwi resay. Semedê ameyişê başçawişî rî zî mi telefoni daybi kerdiş.

Ma şî mezeli ser. Şarê dêwi zî amebi pê ser. Destê dewijan tim ma heti besteybi feqet ina ray tîkê xam asayni. Herunda ters û şermî di seki hêrsbiyaye bî. Ge-ge hakimî qalî kerdîni, vatnî wexto ki ê semedê keşifi ra şîni dewan, dewijan dey rî kavîri serebir-naynî, izzet û ikram kerdîni. Ina ray getino hewa néasaynî.

Ma emir da, ma va "Tirban aki". Tanî dewijî qayîl nêbi, seki vajî "Şîma meytanê ma zî tirban di rehet nêverdanî, caran kê meyt tîbi ra vejeni? Gune wo." Mi va:

-Gerre biyo, ganî ma aki û ti ra biewnî.

Ay beyntar di mi başçawiş ant yew kinar, ez ti ra persaya. Va:

-Inê tim ino hewa yî. Yew kermata silehandê jînî esta. Topê jînî destâ te-roristan i. Sewki ma ino hewa nêkî, roj yeno ma rî bela benî. Ez qet qayîl nêbiya mi dest ra nezih vejiyo feqet remaynî, mi zî ti ra şik kerd. Ma pey ra veng da, nêvindertî, ma va qey çekî te de estî, cûka ma mecbur mendî, ma pa nay. Mi va belkî te-roristî bî, nêkî qey ez gêj a ez ina kena.

A gami dersê krîmînoloji yê ki ma fakulte di wendîbî, kewti mi virî, mi qalandê jey ra bawer nêkerd. Zaf-tanî tecrubey mi bi, heta inka mi za ifadey girewtî. Wa o vajo, ey raşt nêvatnî.

Beyntardê qalan di başçawiş batbi "Akerdişê tirban îcab nêkeno, xwi ra dewijî zî nêwazeni, şîma veng ra zehmet wenî". Mi zî vaibi "Ma semedê tirban ra amey. Ma ti ra ewnînî."

Neyse, ez ayegraya tirban ser. Meytî tirban ra vefî. Kefenanê jînê sipîyan ser o lekey heri bî. Dim a kefe-nê jînî akerdi. Werrekina nêakerdîni! Diyarî-şo ki mi dî, leşa carmîdî naki ra cor heta serê seri, kê vatnî qay seradi ya. Nêhûmariaynî ki çendi hebi guley bede ginaybi. Seki mi va, leşa jey tam heway seradi kerdî. Ey cenêki zî çendi hebi sênedê ja ginaybi.

Heti' ra ez şoke bîbiya û xewt kewtbi mi pîze hetî ra zî ti çindi vajî ez indi hêrs bîbiya. Mesela weş fahm bîni. Başçawiş xwi ra dewijê bêguneyan kişîbî, zûrî zî kerdî, kerdî ki pey mi bixapêno.

Ez şiya heta başçawiş ra "Inka" mi va, "la to mi ra va ki ê remay ew to pey ra pa nawo?"

Başçawiş nêzana vajo se, va:

-Sawci Beg.....

Ez deyamîş nêbiya ki vatişê xwi temam bîko, mi hêrsî reydi hij kerd ser û çend lekmatî pa vistî. Nêzana ey kamî bi, çimê mi ewra yew çanqli ra kewti, mi girewti û mi çend hebi pi ro kirrantî, şar dekewt beyntardê ma, ez tebişta. Epey bâdî, katibê mi vatnî ki, kê vatnî qay ez delî bîbiya. Hewawo ki vatnî, ci ray kesi ez ay hewa hêrsbiyaye nêdibîya. Raşa zî çimê mi tarî bîbi, sekî Franz Kafka'y néva "Mi

şînaynî des hebi carmêdan di lej bîka", indi ki mi ginaybi, zor bê mi şîbi.

Be'dî tîkî hêrsê mi niş, ma otopsi qedêney ew ma dest bi girewtîşê ifadey dewijan kerd. Dewijan ra tanîni Tirkî nêzanaynî, tanîni zî tîkî zanaynî feqet bes nêbi. Mi Kurdkî zanaynî, la verî yew dewijî ma ri qalê dewijanê binan tadaynî Tirkî. Ez ewniyaya ki o zî ge-ge nişo weş tado, yew şik kewt pîzedî mi, mi va beno ki eskeran ra bîterso ew vatanê ki dewijî vanî hemînî nêtado. Mi zî xwi heti kontrol kerdî, feqet çîyo ki jey vatnî ma zabiti di nuştîni. Be'dî mi o vînderna ew mi xwi bi xwi ifadey girewtî.

Râşteya mesela bî xwi ino hewa bî: Başçawişî û eskerandê qereqolî vistbi ina dêwi ser. Şarê dêwi herme, ci cenî, ci carmîdî, ci gedey râştey ciwanen ser o antî pê ser. Çiki cenî yû gedey bî, dor-marê ciwanen di vindernaybî. Carmêdan ra zî vatbî ki ganî ê cenî û gedeyandê xwi heti xwi bane bîki ew ciwanen ser o vazdî, şerî-bêrî, sekî kê eskeroy di ta'lîm kenî. Feqîran yew ray eskereya xwi kerdî, indi hey ray içtîma xwi bîbi, gilana nêxelisyayıbî. Ti ra tanîni nêwaştî xwi rût bîki labelê darbê xwi ki werdi mecbur mendîbî jîni zî xwi rût kerdî.

Başçawiş vato, hetana ki şîma mi rî nêzana çindi hebi şesderban û tifingan niyari, ganî şîma ino hewa bîki. Sewki ino şîma rî bes nêbo, ez cenîyanê şîma zî heway şîma rût kena. De şîma zanî!

Inê carmêdan ra ayo ki ba'dî kişîabi, darbê xwi zî werdi, gilana vatbî "Ez xwi rût nêkena, ne şesderbê mi ne tifingê mi ne zî yew suçê mi esto". Vir da, wê da, yewbînan qırıki kewtîbî, başçawiş nengî bede çînaybî, jey zî başçawişî çînaybî; başçawişî tifingê xwi antî lajet heway seradi kerdî. Cenîya jey zî nêşiyabi vîndo, vazdaybî gala başçawişî kerdî, başçawişî pa nabi a zî kişîbî. Mevaji ki ino başçawiş, inê guran ra ver zî zaf amebi a dêwi, şar heme jey dest di el-eman bi.

Ez serey to nêdejna, kirra qalî ma gurey xwi qedêna, ma a şewi epey herey ayegray. Cîpi miyan di ca mi nêkewt, mi va "Ganî ez inê gûrî ser o vindira, qey senî kê şîni ino hewa bîki?"

Râşta zî ez da'wa ser o vinderta. Başçawiş demeyê hepis di mend, be'dî qerar Yargitay di herîmiya, peynî di zî vera diya. Ay bentar di başçawişî zî ez dabiya mehkema. Qatiley ô zalimeyda xwi rî nêvatnî, vatnî ki şarî miyan di mi şerîf ordî şikitö ew mi heqaret bede kerdî. Jînî gore mi yew suco pîl kerdî. Naşt-daşta vatnî "Yew nişo vera mîrdimandê eskerîya giwo inas-arên boro". Ci heyf ki "pîlê ma" zî inawa duşunmîş bîni. Cûka verî ez surgun kerdî ki wa pey ez poşman ba.

Mi ki ina mesela di şarê xwi, mîleta xwi weş şinasnay ez zî hînî vera vera bediliyaya. Ti ki vajî "Qey la verî to nêzanaynî?" E, zanayîş mi zanaynî, feqet indi zi nê. Ez xwi hesiyabiya, tersî mi remabi. "Qey" mi xwi bi xwi vatnî, "yew xorto dewijo nêwendewo teze şîno ver a bênamûsey vîndo, xwi fedâ bîko, se biyo mi ki ez viyey xwi rona?"

Feqet vatiş asan o, surgûni ra pey gurey gureyîni mi serî ser di amey. Mi ser o çindi hebi da'wey bîni zî abi. Ge vatnî "Kurdçîyey keno", ge vatnî "Solçîyey keno". Hîni bi ay hewa namay mi vejiya. Mi ri yew qulqulika ruşwetî zî veti. Kurdçîyey, solçîyey, ruşwet. Dim a ez gure ra vista, heqî awuqatey kerdî mi dest ra girewtî. Zaf nêmend ki ceza hefsî zî bîdi mi.

Tena a mendî ki mi serî ser di nêardi.

Hinî ne meslega min a verêni mendî bi zî mi şîyaynî awuqatey bîka. Gedey mi pîl bîni. Cenîya mi nêxebiyaynî. Hûmay esto, kê ganî raşî vajî, cenêki qet rojî mirûzê xwi tîş nêkerdî, çîyekî nêva. A zî mesela weş fahm kerdî, zanaynî ki mi yew çîdo nebaş nêkerdî.

Mi se kerdî? Heme ci ra ver mi tehemulê bênamûsey û neheqey nêkerdî. Ey diyini, ez hinî xwi aqiliyabiya, mi zî hînî 'eslî xwi iñkar nêkerdî.

Xeta kura bî? Ayê ki mi şinasnenî heme zanî ki ez tenezulê ruşwetî nêkerdî. Aynanî ki ceza day mi û ez kar ra vista zî zanaynî ki eleqey min û ruşwetî pi ya çîno. Demewo ki mehkema di mi ser o qerar da, sawcî û hakim xwi ver kewtî, nêşiyaynî çimandê mi ra biewni. Jînî zî texmîn kerdîni ki ina yew dek a, yew hilekarey û sextekarey a, ino yew negewo bêgiranê wo ki mi mil biyo.

Ez ki kar ra vista ez hînî Diyarbekir di menda, mi nêwaştî ez key xwi bera Wan. Diyarbekir di ez yew deme betal geyraya. Peydakerdişê karî asan nêbi. Yewî kar nêdaynî kê. Diyarbekir di nas û dostê mi, imbazî mi zaf bî. İmbazan ra yewî va "Ti şîni mi heti bixebeitî". Mi zî jey heti dest bede kerd ez xebitîyaya. Verî karê mi xirab nêbi. Herçî edîlya ya, ez nêşîni, ez te-na yazixane di xebitîyaynî. Ez qayîniya vaja imbazdê xwi visîr, feqet bin di nêbo mi zî inda jey huquq zanaynî.

Ez yew deme xebitîyaya, be'dî ez ewniyaya ki imbaz zî minetanê xwi bi mi keno, mi yew xebatkarê xwi hesib-neno. Sekî ez bîra, guran ra çîyekî fahm nêka. O zî neheq nêbi, diploma mi pere nêkerdî, mi nêşiyaynî şîra 'edîlya, mi xwi bi xwi nêşiyaynî da'wa bigira. Ez ewniyaya ki veng a, hetana ki ma pi ya pîs nêbi, mi bi weşî ay kar ca di verda.

Ti ra pey mi se kerd? De ha to ra aseno. Ti ki vajî "Gelo ti poşman i?" Kê raştî vajî mîrdimo sawcî nêwazeno bîbo erzihalcî. Mîrdîm nêşîyo her kesî rî derdî xwi vajo. Hetê debara keyî û kulfetî ra mi zaf kezlatey û şerpizey anti. Feqet ma ki veysaney ver zî nêmirî. Hetê bîn ra, wexto ki ez xwi adîrî ver di germ kena, yan zî adîr veynena. Prometeus keweno mi virî. Semedo ki jey koyê Olîmposî di Hûmayan ra adîr tirawitî, her roj qertelan û bazan quesba jey neqûri kerdîn. Adîr insanî rî tirawitî ki wa insan him xwi jey ver di germ bîko, him zî wa pey tarî ra bixelisiyo. Mîrdîm ki neheqey qebul nêkeno, mesela ayo ki inka şarê xwi ser o kişîyeno, şehîdî beno zî heway Prometeusî yo. Gedey şehîdanê ma ewro bê may û bê pî sekûr û seyek manenî. Qey la gan û gûniya ma ey şehîdanê ma ra hîna erjayedîr?

Qalî zaf i, nêqediyenê wariza. Eki ti meraq kenî, ez vajî, ez kerdandê xwi ra poşman niya. Ez zana ki gedey mi, gedey gedanê mi, meşti nengan mi nêçinenî. Ina mi rî bes a

VI

Wexto ki 'Elî Rîza Begî inî qalî kerdî, mi wit nêkerdî. Qalê jey ki qediyay, mi teyba xwi paday, ti ra xatir waştî û ez teber kewta. Cêko ki mi qalê jey gûşdarîbî, ez bêheş bîbiya.

Ez yewna roj Diyarbekir di menda û ba'dî ayegraya Estenbul.

Ez qet qayîl nêbiya ki mesela nêşkerdişê vatanê 'Elî Rizay di sozê xwi biwerâ. Estenbul di mi şefî xwi ra va ki hal û mesela ino hewa. Berxudar

DİYARBEKİR Dİ HEWTEYÊ PEYENÊ SERRA 1991'İ

Hesenî GİRAN

16. 12. 1991

Pancêsê ina aşımı di kongreya fewqalade ya HEP yanî Halkın Emek Partisi (Partiya Keda Şarı) bi. Xusûsîyetanê na kongre ra yew zî o bi ki te de vernî ra heta peynî Kurdkî qalî bi (ame qisekerdiş). Herçîas ki kongre di ge-ge Tirkî zî qalî bi labelê qalîkerdiş Tirkî zî tadiyav Kirdasî (Kurmancî) ser. Cêkû Tirkîye di cumhûriyet ilan biyo, raya verêni yew partiya legali di Kurdkî qalî beno, anonsî û mu'ameley bi ziwanê Kurdkî benî. No wezîyet Kurdistanê Vakûri (Kurdistanê Şîmalî) di yew çîyo nik û newe wo, yew çîdo "xam" o. Heze ki ma newe marda xwi ra bîbi.

Kurdîkî ra zî vêşê vêşan Kirdasî, zav tanî zî Kirdkî (Zazaki, Dimilki) qalî bi. Sermêne Şûbeyê HEP a Diyarbekir, Huseyîn Turhîliyê Çewlîgijî (Bingolijî) Kirdkî (Zazaki) qalî kerd. Kirdkî qalîkerdişê yê zav keyfî mi ard. Xwi ra qalîkerdiş Kirdasî mi weş fahm zî nêkerdi.

Sefaretxaneyê DYâ (Dewletanê Yewbiyayanê Amerika), İsveç (Swêd) û Almanya zî qasidî xwi erşawitî na kongra.

Yewna çîyo ki dim a gazetanê Tirkan zav behsê yê kerd, heze mîman ameyişê Esma Öveç Öcalanî bi. Esma Öveç Öcalanî maya 'Evdila Öcalanî (Apo) ya. Meb'usânî Diyarbekir ra Xetîb Dicle, Leyla Zana û nuştoxanê (yazar) Kurdan ra Musa Anterî, kongre di destê Esma Ö. Öcalanî muçi kerdî. Cend rojî gazetanê Tirkan di qalî qala muçi kerdî destê ya bi.

Güven Özatay heyâni peynî na kongre idare kerdî.

Ahmet Karataş, Hamit Geylanî, Kemal Okutan, Cebbar Laygara, Mürûvvet Cacım, Feridun Yazar, Yaşar Kaya û Nurettin Basutî kongre di qalî kerd.

Peyni di seçim bi. Feridun Yazar bi serekê umûmî yê na partî. Kongre HEP bi ayhewa qediyat.

25. 12. 1991

Nuşîşê gazetey Cumhuriyeti (23. 12. 1991) gore, Bongila (Solxan) di eskeranê dewleti panc gerillay kişî. Nê gerillayan ra di tenî Pasûrij (Quip) i. Hîri hîzîrî mîrdim Pasûr ra şono cinazanê nê di tenanano. Wexto ki nîzdî Pasûr kenî, eskerî û tîmî nêverdanî ki qelebalix şîro Pasûr. Aya ser ra Pasûrî miyan di da-hîzîrî mîrdim nê kerdîşê eskeran ê tîman protesto keno. Yê û komando danî pê ro.

Dim a Licê ra zî şar mesela Pasûrijan pey hesiyêno, nîzdî heş hîzîrî mîrdim wazeno ki şîro Pasûr. Tîmî nêverdanî, weyra zî hedîsey vejiyêni. Esker tifingan şîri ra nano. Urfi Aksakal mireno, zavî zî birîndar benî.

Hewawo ki Cumhuriyet eyro nuseno, hedîseyanê Licê û Pasûrî di hîri eskerî û hewt sivîl mîrdî.

Farcîn (Silîvan) di zî telebey lîse hedîseyanê Pasûr protesto keno. Yê û eskerî zî danê pê ro. Yew telebe birîndar benî.

Pasûr û Tîlerman (Kızıltepe) di semedî protestoy ra şar dikananê xwi nêakeno.

Ez şan di yew emeli di qalî kena, varo:

-Perey 'enê ma şînî Farcîn, nîzdî Farcînî di tanî mîrdimî raştî ma amey. Va "Meşeri, Farcîn di herb ol!" Ma zî tepe ayegray.

Yew şofîr vano: -Perey tanî rayanî otobusa Quipî (Pasûrî) wenîşti ki şîri Quip. Nîzdî Quipî di eskeranî otobüsü 'edîlînaya (vindamaya), nêverdawo ki şîri Quipî miyan. Rayanî vato "Ma vera dî, ma xwi rî tepe ayegrayenî şîri Diyarbekir." Merdim vano qey herbo daxîfî yo. Eskeran nêverdawo ayegrayî zî. No çend rojî yo esker nêverdano ki ci kes hetê Quip û Licê ra şîro. Rayîri girote y

Haziriya Qetliameke nuh

Dewleta Tirk ji havîna çûyî û vir ve ye metodê êrîşkar ên nuh didomîne. Raste rast gullan li xelkê direşinîn. Kesên welatparêz ji malen wan, li kuçan dirin û dû re dikujin, davêjin çolan. Nava rojê, li merkeza bajaran kesên welatparêz ji aliye kesen bi maske ve tênu kuştin.

Piştî hilbijartina 20'ê Çirîya Pêşîn hukûmeta Demîrel-Înonu di hemû beyanen xwe de dan diyarkirin ku pirsa Kurd, bes bi riya demokrasî û mafen mirovî dikare hel bibe", "îşkence wê rabe, dîwârén qereqolan wê bi cam be", "emê idareyek sefaf, ji xelkê re vekirî û di bin awirê xelkê de, çekin", "emê tu carî nehêlin berê lûleyen hêzén ewlekari bizivire ser xelkê, emê bi "sefget" ber bi xelkê Kurd herin", "emê cînayetên ku gesasê wan ne diyarın, derxin".

Rastî bi berevajiya beyanen hukûmete derket. İşkence bi hemû wehşetiya xwe dom dike. Wek qetliama Licê û Pasûrê, berê lûleyen leşkeran bêpaxav ketin sîngâ xelkê. Qesasen kuştinên nenas li aliye bi-hêlin, her çiqas diçe cînayetên qesas nenas dom din. Bes li Nusêbinê di vê meha dawî de 6 kes hatin kuştin. Qesasen bûyeran yek jî hîn nehatiye girtin.

Di van 7 mehîn dawîn de li Kurdistanê hejmara cînayetên qesasen wan nenas derket 50'yi.

Ji bo hinekan dibe qesasen van cînayetên siyasi ne diyar bin, lê ji bo me xwes diyar e; dewlet e. Li Tirkîye gelek kesen demokrat, cep, parêzgeren mafen mirovî weka ku kontr-gerîla ne perçekî dewletê be û ji aliye dewletê ve nayê idarekirin, failen van bûyeran kontr-gerîla dibînin û wê jî ji hu-

kûmete re şikayet din. Lêtıştê ku nayê fêm kirin gelek Kurd ji di kovar û rojnamen xwe de dewlet û kontr-gerîlayek wek ku du tîştên cihê bin, didin hemberi hev û bi vî rengi dîbin aîkar ku ruyê dewletê bi perda kontr-gerîlayek bê vesartin.

Hukûmeta nuh bi kînên xwe û di van demen dawiyê de bi gotinên xwe dide diyarkirin ku ew ji Kurden mafadxawazkir qet hez na. Bi ci riye dibe bila bibe dixwaze wan qir bikin. Her ji bo vê mebestê ji roja 8'ê Çileya Paşin heta nîvî meha Çileya Paşin bi balafiran li herêma Şîrnexê xistin. Berdevkîn dewletê di televizyonê de piştî nûçeya ku Demîrel dibêje "emê bi şefqet ber bi xelkê herêmemebest Kurd e-herin", nûçeya "hêzén me piştî êrîşen hewayî xesarek mezin dan cûdaxwazîn 'terorîst', me ji wan li dor 500-600 kesî

kuştin".

Ji xwe nuha giregirêne dewletê dest bi haziriya tatbîqkirina planen xwe yên êrîşkar û nuh din. Him li Kurdistanê bi terorek mezin mafadxawazkirin Kurd bê teşir bikin, him jî li gor guherîn muhtemel mudaxela Kurdistanâ Iraqê bikin, hêzîn xwe li nêzî hudûd di hereketê de bîhêlin. Cimki di van demen dawî de gelek sinal hene ku DYA dixwaze Sadam bixîne û herwisa di rojnamen Amerika yên sereke de li hember Kurdan bayekî erînî heye. Ev tişt ji bo telaşa dewleta Tirk têr dike. Herçiqas serokê Erkan-î Herbê ya DYA Colin Powell di beyanen xwe de got "giraniya planen ku em

çedîkin ne li ser Kurda ye" jî lê disa dilê Tirkîye neket ci.

Giregirêne dewletê ji bo êrîşen xwe yên buharê ji nuha ve xelkê, raya gişti hâzir din. Wezirê Hundurîn İsmet Sezgin, Hayri Kozaçioğlu, Kumandanê Tevayı yê Cendirma Eşref Bitlis û hineken din di civîna çapemeniyê de gotin; "PKK di haziriya êrîşa buharê de ye". Serokdewletê Tirkîye Turgut Ozal got buharê beriya ku ew êrîş bikin, emê êrîş wan bikin; "Ez vekirî dîbîm di dema pêsiya me de Hêzîn Çekdarêne Tirk bi hêzeke mezin wê were herêmê". Serokwezir Demîrel ji di axafineke xwe de got:

"Di dema Kibrisê de 6 helî-kopterên me hebûn, lê nuha 60 helîkopterên me hene. Emê pişta wan biskinin". Wezirê Parastinê Nevzat Ayaz: "Li herêmê Kolorduya Ewleyî hatiye damezrandin. Eskerek bi tenê jî bêyî tedribâ komando namîne." Serokê Erkan-î Herbê Doğan Güreş ji di merasimekê de weha got: "Ez soz didim we, di demek nêz de emê heyfa xwe hilînin".

Weha xuya ye ku, buharê, dewleta Tirk di bin serokatiya hukûmeta bi "şefqet" û "şefaf" a Demîrel-Înonu de dixwaze bi qetliamên nuh tevgera Kurd him li Kurdistanâ Tirkîye û him jî li Kurdistanâ Iraqê bifetisine.

Mîrza Bextiyar

"Hingor Baş" Xwendevanno!

Mihriv biçine ser xwanê (kerem kin, em herin ser sifre)

Mihriv renc medine bano (zehmete zede medin xanim)

Pelidxana hundurvan (muayenexana daxiliyeci)

Xerîdar (muşteri)

Qeda, Zinde be (temam, sihhet be)

Herduwan ji hezmeda zanoşka Dicîlê karkirin (Herduyan ji imtihana Universita Dicleyê qezenc kirin)

Di beqqal da, di pincarfiros da, di qesap da (ya sitar, kevir ibbare! Çawa di beqal de?

Maşalê beqal û qesab vê kitêbê naxwînin, nexwe wê li welatê me disa xwîn bê rijandin.

Bavê min kûveçere zozanê bahrawar çiqası da kode? (bavê min mîrga Bahrawarê bi çiqası da icare?)

Hûnê bibejin min çawa tercume kir? Min li jor gotibû; bi saya Tirkî.

Edî wext dereng bû, em rabûn. Berî ku em xatir ji hev bixwazin mamostê min got:

-Tu zanî ez cewitîm.(13)

Min got "de bes e, edî hew dikanim bikenim"

Got:

DİYARBEKİR Dİ Dİ HEWTEYÊ...

koşkarî (sewlerdzi) akerde yi. Yoxurt Pazariyê verenî di (inka ti ra vanî Sebzê Pazarı) zî yew firni akerda ya. Miletî rîz biya, xwi rî nan erînena. Nanrotox û yew ceniya nanerînayoxi pê kewtbî.

Tretuwaran (qaldırıman) ser o tewir tewir rotokî bî. Qorrînî gazetey 'ar di rakerdi, kel-melê xwi ser o ronabi, rotî. Qorrîn zî kel-melê xwi dezgey xwi ser nabi. Se ki? Bi ay hewa nefeqey xwi vîtnî, debara xwi kerdî.

Dim a ez hetê Berê Sara (Saray Kapısı) ra şona. No ca'de di zî heme ca -buroyê awukatan û mu'ayenexaneyê doktoran heme-padaye yi. Ez ayeğrena şona yew çayxane ki biney (tikê) roşa, labelê çayxane di mîrdim herri fino 'ard nîkewna, endi sexlet o. Millet gurguma, teriqnena; kaxidan ro, tewla ro, nezele ro, maça qızî ro sur biy, he-hey leminê! Ti vanî qey mehşer roniyawo. Yew qifley miştirîyan şono, di-hîri qifley yenî. Ez ver bi Belediya Verenî ra şona, hetanî weyra zî dikanî heme girewte yi. Ez şona nîzdî Ule camî (Ulu Camî) di binê Kutubxaney Şâri (Halk Kütüphanesi) ra ewniyêna, weyra yew qehwexane akerde wo. Ez ay qehwe di yew çay şimena. Gamina pey ez wardeña ver bi Balıqları (Balıqlarbaşı) şona. Ay cayan a zî dikanî akerde niy. Tena Aşxaney Onuran (Onur Lokantası), yew dikanî qedayıfî û yew dikanî

hinî se ki? Eki zerra Bileşmiş Milet (yanî Birleşmiş Milletler-Heseni Giran) biwazo şîna heqê Kurdan bido. Cimki hinî Kurdi zî xwi hesiyenî.

Yewbîna camerd -yew devîjî Pîranî- ma heti ronişte wo. Ez yê (jey) ra persena, ez vanâ:

-Dayza (datîza) ti na mesela rî se vanî? Çî hêsdê ti kweno yanâ?

Vano: -Heyran wilay ti raşti persî, ma heti bêvengey a. Xebera ma dinya ra zav cîna. İno çeher-panç rojî yo ki ez Suki (Diyarbekir) d' a, ez xeberan pey hesiyêna. Dewi di xebera ma ci ra esta?

27.12.1991

Eyro varan vareno. Gurey zimistanî bellî nêbeno. Rojî dinya weş a, rojî bîn to dî ki tadiya, zav serd bi, kî nêzanî.

Polisi eyro zî tanî cayan di vinderte yi. Dikanî akerde yi labelê qali qala dikananê padayanê vizrênan a. Vanî "Semedê propaganda padayıshe dikanan ra polisan vizér tanî militanî tebişî".

Gazetey Cumhuriyeti eyro derheqê Diyarbekirâ vizrêni di nuşto, vano "Diyarbakır: Ölü Kent" (Diyarbekir: Şaristano Merde).

Şan di xeberi yena, vanî "Eyro Pîran, Erxenî Ü Çinar di dikandaran dikanê xwi nêakerdi".

Wina (ina) haseno ki Kurdi hinî rasta xwi hesiyenî.


Ji Weşanxana Jîna Nû çar kitêbên nuh

- * Yeni çağda ve son çağda Kurt hareketi(kolektif)
- * Hunerên Tabloyen Şerefnamê (Abdulreqib Yusif)
- * Kurdistan û Kurd (Dr. Qasimlo)
- * Folklorê ma ra çend numûney (Malmisanij)

Adresa xwestinê
Box: 30
740 22 Bâlingen/ SWEDEN

Xaçepîrs

Amadekar: S. Rêving



Çeperast:

1.a- Meelim, kesen ku kesen din hîn dike. b- daneki rojê 2.a- sala ku em tê de ne. b- hazir. 3.a- meydan, sahe. b- Pêşnavê stranbêjekî Kurd û Zaxoyî ku hukûmeta Seddam jehir dayê û kuşt. c- rîz, sire, ci. 4.a- Listikek Kurdi ku bi du kesan û bi 32 berikan tê listin. b- mîde 5.a- Navê bi Kurdi û Diyarbekir. b- Bi Tirkî kurtiya Cumhuriyeta Tirkîye. Li devora Botan ji bo gopaleñ ku di binê wan ve şîşeki hesin heye. (berevajî) 6.a- Aletekî durinê, çinînê. b-

Stranbêjekî Ermanî ku bi Kurdi distre. c- rîh. 7.a- du herfîn bêdeng b- zirt, gotinê giran, lê vala (berevajî) c- Heywana ducan, hemil. 8.a- Hejmarek b- Navekî kuran. 9.a- Firinde, tev cûkên biçük û mezin. 10.a- Du herfîn bêdeng b- Navê mîletekî cîranen Kurdistan. 11.a- kevir. Firehiya qumaşekî. b- Bi Soranî "bab, bav". 12.a- Dewama pîrsa yekem ya çeperast. b- No, ne, nexer.

Serejêr:

1.a- Danerê rojnameya pêsi a Kurdi

"Kurdistan" ku ji malbata Bedirxaniyan e. 2.a- Şivik, gopal b-heq. c- Di Kurmancî de pronaveki kesi, zamîr. 3.a- Navê Kurdish kujê celad, serokê hukûmeta iraqê (berevajî) b- du herfîn bêdeng. c- Di Kurmancî de pronaveki seksî. 4.a- Dîn, diyanet b- paşdaçekek (berevajî) c- Laşê kesê mirî. 5.a- Pronaveki seksî. b- Her tîştê ku ji bo şewitandinê bi kar tê c- daçekek 6.a- Cûrekî hunerê ku li ser sehnê tê pêşkêşkirin. b- Pîstikên ku bi piranî ji çerma çedîkin û fişekîn tivinga dixinê û li pişt û sîngâ xwe dişidînîn. (berevajî) 7.a- Navê eşireke mezin li Kurdistanâ iraqê b- du herfîn bêdeng 8.a- Tîşt, dar, yan mirovê pir qayîm, xwe li ber tîştan digre. b- Beyraq. 9.a- Ne nîr (berevajî) b- Aletê ku pê por rast dikin. c- Mesele, yan tîştê ku pir tevlihev. 10.a- Mîrişk, tutik. b- kenarê çem û deryayan (berevajî) 11.a- Karê ku mirov giyayen biyanî ku li zeviyan şîn dibe, paqîj dike, eşef. b- hêt 12.a- tek, kit, hebek bi tenê (berevajî) b- Kese ku por, birî, û çermê laşê wan pir spî ye, çûr c- Bi Soranî "Hêvi".

gillî ra (pirr) polisi vinderte yi. Rayir a ez hewnêna ki Qurîçesme (Kuruçesme) ra heta Ofis, her di kiştanê rayiri di dikanî padaye yi (Ofis di yew-di hebi akerde yi). Tanî qîrnîyan û û ca'dan di polisi pawenî. Ma ki şonî merkezê şaristanî, Dörtol û Berê Koy, ez ewnêna ki ewta dikanî heme padaye yi, polisi zi hîna zav i. Set et yewndes di ez şona di gazeteyan (Cumhuriyet û Millîyet) erînena. Gazetey weş roşiyenî, gazeterotoxî keyfîşî. Ez hetê Berê Sara (Saray Kapısı) ra şona. No ca'de di zî heme ca -buroyê awukatan û mu'ayenexaneyê doktoran heme-padaye yi. Ez ayeğrena şona yew çayxane ki biney (tikê) roşa, labelê çayxane di mîrdim herri fino 'ard nîkewna, endi sexlet o. Millet gurguma, teriqnena; kaxidan ro, tewla ro, nezele ro, maça qızî ro sur biy, he-hey leminê! Ti vanî qey mehşer roniyawo. Yew qifley miştirîyan şono, di-hîri qifley yenî. Ez ver bi Belediya Verenî ra şona, hetanî weyra zî dikanî heme girewte yi. Ez şona nîzdî Ule camî (Ulu Camî) di binê Kutubxaney Şâri (Halk Kütüphanesi) ra ewniyêna, weyra yew qehwexane akerde wo. Ez ay qehwe di yew çay şimena. Gamina pey ez wardeña ver bi Balıqları (Balıqlarbaşı) şona. Ay cayan a zî dikanî akerde niy. Tena Aşxaney Onuran (Onur Lokantası), yew dikanî qedayıfî û yew dikanî

gazetey Cumhuriyeti eyro derheqê Diyarbekirâ vizrêni di nuşto, vano "Diyarbakır: Ölü Kent" (Diyarbekir: Şaristano Merde). Şan di xeberi yena, vanî "Eyro Pîran, Erxenî Ü Çinar di dikandaran dikanê xwi nêakerdi". Wina (ina) haseno ki Kurdi hinî rasta xwi hesiyenî.

Ewrûpa 2020'an

Novîn Harsan

Di kovara "Financial Times" di hejmara 24.01. 1990'i de meqaleyek hat çapkirin. Werga wê meqalé di kovara "El Hawadis" de jî hat weşandin. Dema min ew meqale dît, min pir cidi negirt û min ji xwe re got "xeyalîn hinekan çiqas zengin û rengin in". Meqalé li ser rewşa Ewrûpayê ya coxrafi û siyasi texmînên xwe dikir û xarîteyek coxrafi û siyasi ya Ewrûpa ya sala 2020'i radixist ber çavan.

Dema du sal berê min ew meqale xwend, min bawerî bi texmîna wan neanî ku di 30 salan de xarîta Ewrûpa-yê ya coxrafi û siyasi wê wek texmîna wan biguhere. Erê her du Almanya fîlien ber bi yekîtiyekê ve diçûn, lê min qet texmîn nedikir ku Yekîtiya Sovyet û Yugoslavia wê bi vî rengê iroyin bifelişê. Lê ev guherî-nêñ di du salan de çêbûne û yên ku êdî em bi çavê büyi-nê lê dinêrin pîr ber bi texmîna Financial Times'ê ve ne. Loma ew meqale ji nuh ve hate bîra min. Ez di nav pirtûk û kaxetêñ xwe de li wê kovarê geriyam û min ew dît û ji nuh ve xwend. Ez hîn bêtir şaş mam. Ew guhertinêñ ku ew dibêjin wê di 30 salan de bibin, nîv wan di nav du salan de bûne jî. Nuha ez bawer dikim ew guhertinêñ ku wan texmîn kirin, dikarin çêbibin.

Min ji ber ku ev meqalê gelek balkêş dît dixwazim van texmînên Financial Times ku du sal berê kiribûn, pêşkêşî xwendevanêñ Armancê bikim.

Li gor texmîna Financial Times di sala 2020'i de wê li Ewrûpayê 7 yekîti çêbibin.

1-Yekîtiya Ewrûpayê Rojava: Ji Almanyaya Yek-bûyi, Fransa, İtalya, Katalonya (pişti

Edebiyata Kurdi bi zimanê Erebi

Amedekar: Keder

- Birîna Reş

Tiyatroya Kurdi ya nivîskarê Kurd Mûsa Enter ji aliye Giyas Xiznawî û İndira Yûsif bo Erebi hatiye wergerandin.

- Hêsis û Baran

Ev pirtûka Bavê Nazê ya kurte-çirokan, ji aliye Tewfiq Huseynî ve bo Erebi hatiye wergerandin.

- Ji Helbestêñ
Kurdi ên Nû

Salah Berwarî helbestêñ Şerko Bêkes, Abdulla Pêşew, Refiq Sabir û Latif Helmet dane hev û wergerandine Erebi. Pirtûk 62 rûpel e.

- Delal

Çirokek folkori ye. Qala hezkirina Edûlê keça Zor Temir Paşayê Milî û Derwêşê Evdi dike. Mamoste Hanîf Yûsif ev çirok ji bo çapê amade kiriye û wergerandiye Erebi jî.

BEROS

AŞXANA SERVEKIRÎ



Mahmûd Lewendî

Me rismê Beroşa xwe guhert

Di navbera me de şer derket Hevalen serrût û serbipûr bi hev ketin. Serrût bi ser ketin. Serbipûr ji mecbûr man teslimi serritan bûn. Ji ber wê yekê me ji rismê camêre ku di beroşê de ye guhert. Yanê me bi operasyoneke estetîkî hinek pûr bi serê wi ve kîr.

veqetandina wê ji İspanyayê), Uzkadıa (pişti veqetandina wê ji İspanyayê), İspanya Federalî, Portekîz, Alonya (Bel-çika Flamanî), Flanderz (Bel-çika Fransî), Kraliyeta Britani ku ji İngiltere û ji Wals (Galler) teşkil dibe, Kraliyeta İskoçayê, Kraliyeta İrlandaya Bakur, Cumhuriyeta İrlandî, Luksembûrg û Malta'yê pêk tê.

2- Yekîtiya Ewrûpayâ Navîn: Ji Avusturya, Macaristan, Çekoslovakya, İswiçre, Litvenştain, Polonya, Romanya (tevî Cümhûriyeta Moldavya), Ukrayna û Slovanya (Pişti ku ji Yugoslavyayê veqete) pêk tê.

3- Yekîtiya Balkan: Ji Sirbistan, Arnavut (tevî Kosova ku iro di nav Yugoslavyayê de ye), Makedonya, Bosnak, Bulgaristan, Yunanistan û Kibrîsa Başûr (wê yugoslavya nemîne) pêk tê.

4- Yekîtiya Tirkان: Ji Tirkîye (bîyi Kurdistanê), Azerbeycana Bakur (ya Sovyetê), Azerbeycana Ba-şûr (ya İranê), Kibrîsa Bakur û Turkmenîstanê pêk tê.

5- Yekîtiya Kafkasî: Ji Cumhuriyeta Ermenîstan (tevî Nagorno-Karabax) û ji Gürçistanê pêk tê.

6- Yekîtiya Silavi: Ji Rûsyâ, Ukrayna û ji Rûsyâ Sipî pêk tê.

7- Yekîtiya Baltik û İskandinavya: Ji Swêd, Danîmarka, Norweç, İzlanda, Finlandiya, Estonya, Letonya û Lîtvanyayê pêk tê.

Kovara Financila Times em ji Tirkîye vegetandine, lê ji ber mijara wê bes Ewrûpa ye, nedaye diyarkirin ku wê ci were serê Kurdistana ku ji Tirkîye veqetiye ye. Lê qey wê her ne ji iro xerabtir be?

Bimîne xwes, Feqî Husêñ û Qenc û xwes !

Feqî Husêñ Sağnîc bi navê Pegeviya Hewisina Zmanê Kurdi û Rêzimanê Kurdi du kitêb derxistine. Ji ya pêşî mirov piçekî fam dike, çimkî bi Kurmancî û Tirkî ye. Lê ji kitêba 2. mirov qet tiştekî fam naake. Çimkî hemû bi Kurmanciya Feqî Husêñ e.

A ji we re çend misal ji Rêzimanê Kurdi : "Pranîya qedînekê di danaka qedînekanda, pranîya bi lêkeran di danaka cînavk û lêkeranda dê bêne dabas krin."(r:36)

"Qedandî: Gîşk qedandî vegetandekarî digirin. Bi qedandîve danîna vegetandekan qedandî xwe alî qedandekve ditewîne."(r:43)

Misalek û hin peyv jî li gel Tirkîya wan ji Pegeviya Hewisina Zmanê Kurdi:

"Pîvane bipeyivin, pîvane bixwin, pîvane vezwîn û pîvane binivin. (Ölçülü konusun, ölçülü yiyyin, ölçülü için ve ölçülü uyuyun)." (r:49)



Nivîstan: yazîhane

Cemidgeh: buzdolabı

Xwerekxane: lokanta

Geridgeh: terminal

Pelidxane: muayenehaneye

Hundurvan: dahiliyeci

Psik: fatura

Bde: vergi

Bimîne xwes: hoşça kal

Qenc û xwes: gülé gülé

Komela Mêrên Bindest



Ev serê salekê ye çend mîrên bindest, xebata xwe ya ji bo heq û huquqê mîrên bindest bi awayekî illegal dimesandin. Lê meha berê êdî deyax nekirin û bi awayekî eşkere kongreya xwe çêkirin.

Nêziki 400 mîrên bindest beşdarî kongrê bûn. Amanca wan a ji avakirina Komela Mêrên Bindest ew e ku mîrî disa heq û hêz û karîna xwe ya mîrîfiye bi pasde bistîne. Pişti kefteleft û munaqşeyen dirêj van kesen jérin ji bo Komîta Karger hatin hibijartin:

Mîrî Mêrzad

Şero Repin

Gonço Şeqin

Ardo Pihîn

Pilo Kulmîn



Ji slogan û şiarên wan hinek ev in:

Şerî şerî in

Vi wextî vi zernanî

Hinek mî ne

Ê ku ji xwe re jîn anî

Hinek jî nîr in!

Wi betal kir mîrînanî

hin bakteriyan dûyên fabrika û endustriyan paqij bikin da ku hewa qirej nebe. Lîkoliner, bekteriya sûyano jê ku bi manîpolisyona genê tê afirandin, wê di kulekên fabrika û endustriyan de wek filtre bikarbînin. Ev bakterî koldioksîde diguhezîne hewaya adeti.

* Volkana çiyayê Erebus li qutuba başûrê bi tevî gazên xwe yê volkanî di rojekê de 80 gram zêr dişine der.

Pisik cara yekemîn 2500 sal Berî Miladê li Misirê hatiye kedikirin.

* Diz wê hew karibin otobomila bidizin. Fabrikayê otomobilan bi metodîn nuh otomobilan çedîkin. Di mîstê de koda datayê di motora otomobilê de heye. Dema şofêr mista xwe dixe klîta otomobilê data kodê dixwîne û motor dişixule.

ne karê aqila ye lê rast e

Amadekar: Hesen Mizgîn

* Du Almanên ku di dawiya sala 1991'ê de derketibûn serê çiyayê Alpê ku ji xwe re bigerin; di nav glasiyekê de laşê insanekî ditin. Arkeolog vî laşê 4000 sali ji çiya girtin anîn laboratuvara xwe ku li ser lêkolîn bikin. Ev insanî 4000 sali 1.6 m. dirêj û 40 kg. giran e û ji dema dewra bronze ye.

* Bazara telekmunikasyona, diê % 10 i destê şirketa Almani Siemensê de ye.

* Lîkolinerên Japonî dixwazin bi